



Li dijî daxwazên gelê Kurd, dewlet dev ji darê zorê bernade. Gel jî, ji bo bidestxistina mafên xwe, li nik gerîla têdikoşe û her diçe:

Şer radiperike

Rûpel 8




Qereqolên dewleta Tirk ên li Kurdistanê yek bi yek bi roketên gerîlayên ARGK'ê tîrî xandin. Lewheya wan jî di nav dest û piyan de dimîne.



DI WARÊ MUZÎKÊ DE KOMPONÎSTEKÎ MEZIN: GRÎEG

Grîeg di hunera xwe de giranî dide xweza û folk-lora gelê xwe. Ji bo vê yekê jî, ew melodyyên gelê Norwecê berhev dike, li ser wan dixebite, a-wayek dide wan û di kompozîsyonên xwe de bi kar tîne.

Rûpel 13



EVÎNA LALEŞÊ Û HESRETA ÇIYAYÊ ŞENGALÊ

Kurdên êzîdî ku îro zehfên wan ji warê bav û kalên xwe dûr ketine tevî vê yekê, her-dem bi çardestan bi dinê xwe yê pîroz ve girêdayî mane. Û hesreta veqerî ber bi Çiyayê Şengalê û Laleşê ve hê jî bi xurtî di dilê wan de heye.

Rûpel 16

Xewna min

Ji xebatkar, nivîskar û xwendevanên Welat re, ez qevdek ji gulan, komek silavên welatparêzî ji we re dişînim. Ez dîsa bi şahî û bi dilekî xweş silavên şer û pilingên serê çîyan, şoreşger û welatparêzên gelê Kurd û Kurdistanê dikim.

Ez mirovekê Kurd li Stenbolê me, dixwazim xewn û xyalên xwe ji we re bibêjim. Ez di xew de şeva ku neçime Kurdistanê tune ye. Di xewna xwe de her şev li Kurdistanê me. Ez dibime firok û teyare, gule û bombeyê min naqedin Ez Kurdistanê azad dikim. Ez wezîr û karmendên komara dijmin berhev dikim. Min ji wan dipirsî û digot. "Gelê Tirk ma, cîhan têrî me û we nedikir? Ev heftê (70) sal e em vê zilm û zordestiyê û belengazî û xizanî ji destê we dikişînin. We jiyana me li me heram kir, qey êdî ne bes e?! Dinya bi dor be, dora me hatiye, bi dem be jî dema me hatiye. Em dibînin qehremanê me ji kendala radibin em diçine cîhana evîne."

Jîn û jiyana xweş dibe

Li ba Mem û Zînê

Em ji Xwedayê xwe bi hevî ne Ku azadî û rizgarî û jîn û jiyana me

Wê ji îro ve de dest bi evîndariya xwe bike. Gelê me bi şahî û dilekî xweş bijî, xwendayê rojnameya Welat.

Naifê Rasî

Li ser dawîya şervanekî şoreşger

Ev 70 sal e ku, li Kurdistanê hêzên KT (TC) bi rijandina xwîna gelê Kurd hebûna xwe didomîne. Hêzên mêtîngehkar ji bo ku îro jî li axa Kurdistanê hebûna xwe bidomîne, xwîna şervanan dirijînin. Hêzên mêtîngehkar bi alikariya xwînrîjandinê, bi qirkirinê, bi koçberiyê û bi îşkenceyan incex li Kurdistanê hebûna xwe didomîne. Wekî din nikarin li Kurdistanê hebûna xwe bidomînin. Ji bo vê jî her roj bi destê kontrayan û bi destê xwe welatparêzên karker, gundî û şervanên gelê Kurd dikujin.

Di meha Çileyê de li Dêrika Çiyayê Mazî, xayintî dîsa zû gihîştê hawara hêzên mêtîngehkar. Xayintî dîsa, ji hêzên xwînxwaran re rê vekir, şop ajot û bi berbanga sibehê re dora gund girtin. Bi tanq û top û bi hezaran hêzên xwînxwar top û gulle reşandin ser şervanên Kurd. Şervanan jî bi çekên xwe, bi canê xwe, bi xwîna xwe, bi bîr û baweriya xwe bersiva wan da û berxwedana xwe bi xwîna xwe xemilandin. Lê şervan pênc hebûn, hêzên xwînxwar bi hezaran bûn. Di vî şerî de, şervan radest (teslîm) nebûn. Mîna şêran şer kirin û di dawîya şer de şehîd bûn. Hêzên xwînxwar incex miriyê wan teslîm girtin.

Xwîna şervanan li ser berfê diherikî û diçû nav axa welat.

Ji bo ku jiyana bide sorgulan, kulîlkan û dara azadiyê û her dem bijîn!..

Hêzên xwînxwar digot belkî bi rijandina xwîna şervanan, vê şoreşê bisekinînin. Lê nizanibûn ku, li Kurdistanê bi hezaran sorgul, kulîlk û dara azadiyê bi xwîna şervanan jîn dibin.

Belê sala 1993'ya, meha Çile, li Dêrika Çiyayê Mazî heval Celal Özalp jî bi çar hevalên xwe re şehîd bû. Gelê Kurd şervanekî xwe yî mezin winda kir. Heval Celal jî bi her çar hevalên xwe re ket nav kerwana şehîdên partiya xwe.

Em girtiyê azadiyê dixwazin li ser jiyana heval Celal çend gotinan bibêjin: Heval Celal di sala 1963'yan de li navçeya Bismilê hate dinê. Demek şûn de, bi malbata xwe re çûn bajarê Amed û li Amed mezin bû. Dema ket nav têkoşînê, hîn pirr ciwan bû. Di dawîya 12'ê Îlonê de derket derveyî welat. Li derveyî welat hêvotîna (perwerdehiya) leşkerî û koneyanî dît. Di dema hêvotînê de jî, di hişê wî de tim û tim li axa Kurdistanê têkoşînkirin hebû. Dema hînkariya xwe qedand, vegeriya nav welat. Lê demek şûn de, di sala 1985'an ve li Siwêregê bi destê xayintiyê hate girtin.

Di îşkenceyê de û di Girtîgeha Amedê de, berxwedaneke birûmet da. Di dadgeha

mêtîngehkarên de li rêça partiyê û doza welat xwedî derket û parast. Heval Celal 7 sala li Girtîgeha Amed, Aydin û li Çenakkale raket.

7 sal hesreta welat kişand. Di dawîya 7 salan de, li Girtîgeha Çenakkale hesreta welat xelas bû. Heval Celal berî ku derkeve derve, di dilê wî de ev hebû: "Gava ku ez derkevim derve, ezê xwe li heriya çiyayê Kurdistanê têr bigevizînim."

Gava ku ji deriyê girtîgehê derket, ji çavê wî hêstir dihat û wiha digot: "Ez îro derdikevim, lê belê ji we her yekî parçeyekî bi xwe re dibim derve. Ez we qet ji bîr nakim." Gava ku derket pirr ne kêfxweş bû. Lewre hevalên wî di girtîgehê de diman.

Piştî derket derve demek şûn de, min bihîst ku heval Celal li çiyayê Kurdistanê bûye şervanekî mezin.

Heval Celal mirina te pirr zû bû! Daxwaziya gelê Kurd ji te hebû! Te ev daxwaziya gelê xwe bi pirranî anî cih. Lê wezîfeya te hîn pirr hebû. Lê çavê xayintiyê kor bibe, te ji nav gelê Kurd bir.

Em bawer nakin ku tu miriyî! Tu di dilê me de û di dilê gelê Kurd de her tim jîn dibî. Em te ji bîr nakim!

Heya ku meşa azadiyê serfiraz bibe...

Girtîgeha Taybetî Bursa/Sinco û Bêziman

FERHENGOK

Alubûn: Sekihîn, delîn (kamaşmak)

Alukirin: Sekihandin, delandin (kamaştirmek)

Belakirr: Kesê ku bela xwe li xelkê dide, ji xwe re natebite

Behîvter: Gerih (çağla)

Bobelat: Felaket

Çalap: Yezdan, Reb, Xwedê

Çepel: Gemar, qirêj

Çols: (kaba) Liç

Dirende: Wehşî (Yırtıcı, vahşi)

Dirêş: Delgiç, ji şûjinê dirêjtire, zixt

Girgîn: Berbiçav

Guncan: Guncayîşt (kabiliyet)

Kils: Kirêç

Kizin: Kuşne, gadane (burçak)

Mişext: Firar

Hinav: Hundir

Mêrdezime: Kaos

Perestgeh: Mabed

Sosret: Ecêb

Şîp: Çir (çağlayan)

Tûm: Hevda, ta, mû (saç teli)

Vexwendî: Dawetkirî (çağrılı)

Xela: Tunehiya xwarinê, nebûna qût (kıtılık, açlık)

Xûz: Bûl, kov, piştkov (kambur)

Xûzbûn: Bûlbûn (kamburlaşmak)

Xûzkirin: Bûlkirin (kamburlaştirmek)

Zende: Îbret

Rexneyek li Welat

Pirr hevalên min ên xwendekar hene. Gelek ji wan li zanîngehê ne. Dawîya hefteyê li mala me dicivin. Hemû heval jî Kurd in. Dema axaftinê dest bi Tirkî dikin. An jî di telefonê de dîsa bi Tirkî xeber didin. Rojnameya Welat an jî pirtûkên Kurmancî didim dest wan rojekê lê dinêrin û diavêjin. Dema ku ji wan dipirsim, dibêjin: "Em sehnakine Kurmancî bixwînin." Ê malneketo! Hewqas nexebitîne ku bizanin an jî fêm bikin. Bi rojekê lê dinêrin û diavêjin. Dema ku ez dibêjim: "Werin aboneyê Welat bin" vê carê dibêjin dersa me zehf girîng e, em sehnakine bixebitin. Wexta ku şor tê, dibêjin, em Kurd in û Kurmanc in. Em dixwazin mafê xwe bi destê xwe xin.

Em sê heval in. Me tev xaniyek girt û tev rûdinin. Herdu hevalên min jî parêzer (avûqat) in. Her şev em li ser vê, mijarê gengesiyek dikin. Dibêjin em rewşenbîr in. Em mafê xwe diparêzin. Ema ez dibêjim ku, mirov heger mafê xwe ni-

zanibe dê çawayî bîne ziman? Zimananîn, bixwendin dibe. Hûn zimanê xwe nezarin çawa bixwînin, hûn senakin bixwînin çawa daxwazên xwe hûnê binin ziman. Vê carê serê xwe dikin ber xwe.

Daxwaza min li we û li hemû xortên Kurdan. Hewqas zehmet bikişînin û zimanê xwe bizanbin. Xwedî li zimanê xwe derkevin.

Daxwaziya min ji Welat jî ew e ku, hûn qet naxebitin li ser vê mijarê. Herin, bipirsin, vekolin ka Welat çawa tê xwendin û kî çawa dixwîne. Di nav wan de çend jê dilgeş in. Min îro li bayîyekî rojname pirsî, got lê heftê sê Welat têne firotin û ez 12'an jî vedigerînim. Bi min, ev sêcê we ye. Tu kes nepirsîye.

Daxwaziya mina dawî jî, paşî vê hejmarê yek bi yek zimanê me şareza bikin û li ser abonetiye bisekinin.

Xwedê alîkarê we be.

Bengin Ö. Özdal Stenbol

Berikên gezok

Navnîşana şadiyê!
Hêviya birînen min!
Min bi çavên xwe,
Hîn tu nedîtî

Lê her çend janan
Her çend candanan
Tu carekê li pêş çavên dilê min

Dibî firîşte*
Gul dibin wêneyên te
Pelên daran dibin nameyên te

Çûk dibin stranên te
Nizanim çima?
Her ku ez ber bi te ve tîm
Da ku di bin siya

ramûsanên te de,
Serbest bijîm û hez kim
Ji nişka ve,
Berike* min gez dike?!

Rûxweş

* Firîşt: Pêrî, horî, melaike
* Berik: Fişeng, qurşîn, gulle

Bes e!

Bi hêsani difiroşî
Ji cîgerê dinoşî
Bi tîkçûnê dilxoşî
Bes e êdî serxoşî

Bes e

Bes e

Evqas fêl û canbazî
Evqas dij û nandozî
Tişteka nema bi dizî
De ka bes e, xinizî

Bes e

Bes e

Te çi divê perestî
Ji neyarê rawestî
Cîhan hemû serbestî
Bes e êdî bindestî

Bes e

Bes e

Wilo nabe, tu bêçare
Bazar nabe li ser war
Dijmin nabe dost û yar
Bes e bibî wek neyar

Bes e

Bes e, bes e.

Ferhad Masîro / Kobanê

ARGK'ê Botan qada şer îlan kir

Êdî şer li her derê û bi her awayî berfirehtir dibe û gerila jî, ji bo parçeyek axa welat yê rizgarkirî têkoşîna xwe didomîne. Gerilayên ARGK'ê bi vê armancê Herêma Botan bi giştî qada şer îlan kirin û ji bo gelê li vê herêmê qanûnên şer dane pêş.

Navenda Nûçeyan- Serleşkeriya Qerargeha ARGK'ê ya Eyaleta Botanê, bi belavokê Herêma Botanê qada şer îlan kir. Li gor ku di belavokê de hatiye diyarkirin, piştî Şerê Başûr, hêzên dewletê li Botanê qereqolên xwe bi lez û tirs vala kirine. Hêzên ordiya Tirk ji çiyayan vekişiyane. PKK jî bi xurtbûna hêzên xwe yê şer li gundan êdî bûye xwediyê kontrola herêmê û mewziyên şer.

Di belavokê de rewşa TC'ê jî tê nixandî û wiha tê gotin: "Bêhêzbûn û bêça-

rebûna TC'ê diyar bûye. Di sala şer a 93'an de Herêma Botanê bi giştî qada şer hate îlankirin. Çiya di bin kontrola leşkerî-siyasî ya hêzên me yê gerila de ne. Li bajar û deştan jî, bandora me ya siyasî û otorîteya me bihêztir û xurttir bûye. Ev e, li gorî van rastiyan, Eyaleta Botanê di konferansa partiyê ya yekemîn de biryara îlankirina qada şer a hemû Botanê girt. Li gorî vê de li herêmê jiyana bi giştî di bin kontrola partiyê de û li gor qanûnên şer were birêxistin.

Li gorî vê hemû Botan qada şer e, lê Qilaban (Ulu-dere), Cûdî, Bestler, Beytulşebab û Şirnex di pile (derece) ya yekemîn de qada şer in. Gebar, Çirav û Berwarî di pileya duyemîn, Şax (Çatak) û Mişarê jî di pileya sêyemîn de qada şer in."

Di belavokê de tê xwestin ku, gel jî wezîfeya xwe pêk bîne. Belavok wiha didome: "Di qadên şer de, dê her tişt jî aliyê partî, gerila û hêzên eniyê ve were birêxistin. Dê tu tiştên dijmin û xayînen hevkarên wê neyêne qebûlkin. Dê hemû têkiliyên bi cerdevan û xayînen hevkarên re bê birrîn. Dê bêyî destûra hêzên rizgariya neteweyî ticaret û qaçaxçîti neyê kirin. Dê her tişt li gor qanûnên şer bêne bi serûberkirin, birêxistin û kontrolkirin."

Li Wanê otêlek hate şewitandin

Navenda Nûçeyan- Şeva 30'yê Hezîranê li Wanê otêlek ku bi giştî biyanî lê dimînin hate şewitandin. Di vê bûyerê de 2 jê biyanî 11 kes mirin, 28 kes jî birîndar bûn.

Xwediyên vê otêlê, berê jî gelek caran bi hinceta ku li otêlê fuhuş tê kirin û alkôlê firoto ji aliyê olperestan ve hatibûne tehdîtkirin. Beriya bûyerê bi rojekê jî, nêzîkî 40 kes ji nûnerên olperestan ji bo girtina vê otêlê derketibûne cem walî û wiha gotibûn: "Ev otêl cihê fuhuşê ye. Ger hûn negirin emê hel bikin."

Li gor agahiyan ev bûyer wiha pêk hat. Şeva 30'yê Hezîranê, saet di 03.00'an de grûbek tê otêlê û derdikevin qata sisêyan. Li vir jinek Romen digirin û difetisînin. Dû re benzîne li der û dor dirêjin û molotofan diavêjin. Piştî agir bi otêlê dikeve derdikevin derve û li vir jî erebeyek dişewitînin.

Heta niha 4 kes wek failên vê bûyerê hatine girtin. Ev bûyer di nava rayedarên dewletê de jî bû sebebê beyanên dijraber. Cara pêşî Midûrê Emniyeta Wanê, ihtî-

mala sabotajê red kir û da xuyan ku, agir ji qontaxa elektrîkê dest pê kiriye. Dû re Waliyê Herêma Rêveberiya Taybetî Ünal Erkan, bi beyanekê diyar kir ku ev bûyer sabotaj e. Piştî van daxuyanîyan Wezîrê Dewletê û Nûnerê Hikûmetê Yildirim Aktuna di beyana xwe de wiha got: "Ev bûyer bi terorê re eleqedar nîn e."

Şewitandina Otêla Yenîgün, wek livbaziyeke olperestan tê ditin, lê heta niha tu hêzî berpirsiyariya vê bûyerê negirtiye ser xwe.

Li Misircê terora polîsan

Navenda Nûçeyan- Roja 29'ê Hezîranê li navçeya Sêrtê Misircê, polîsan erîşî ser esnaf û gelê nava sûkê kir. Li gor nûçeyanê me yê Misircê, roja sêşemê piştî nivro, polîsên Emniyeta Misircê, tevî komserekî pêşî besebeb bela xwe li esnafekî bi navê Mehmet Emîndan, eşyayên dikana wî anîn xwarê, şikandin û bela wela kirin. Dû re erîşî ser kesên li devê deriyê qehwexaneyan rûniştî, kirin.

Gelê di nav sûkê de bêyî weqetandin dane ber jop û dîpçikan. Pêvajoya saetekê, polîsên Misircê tehdeyeke mezin dane gel û heqaretê giran li kesên di nav sûkê de kirin. Piştî vê bû-

yerê dîsa di nav sûkê de polîsan bi dengê bilind li gel gefan xwar.

Li ser vê zilma polîsan, hin esnafan muracaetî qeyemeqam kirin, kesî ew guhdarî nekirin.

Li aliyê din cendermeyên alaya Maxrîbê Muxtarê Gozeldere Mehmet Akgül û gundiye-kî ji navê Ahmedê Misto bi alîgiriya PKK'ê sûcdar kirin û xistin bin çav.

Li Washingtonê KURD-HA

Ajansa Nûçeyan a Kurdistanê (KURD-HA) çepera xebatên xwe berfireh dike. Berî vê bi demê buroya xwe ya dawî li Moskovê veke. KURD-HA niha jî di 19'ê Hezîrana 1993'yan de yekê li Washingtonê vekir. Ev buroya li Amerîka bi alîkariya welatparêzên Kurd ên ku li wir dijîn vebû. Navê buroyê yê resmî American Kurdish Information Network e. KURD-HA bi vê mebestê dixwaze raya giştî, hikûmeta dewletên yekbûyî yê Amerîka û çapemeniyê ji têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistanê agahdar bike.

HAWAR

Dilbixwîn

Ji Platforma Kongreya YRWK'ê sisêyan

Ez bawer dikim ev cara yekemîn e ku, evqas rewşenbîrên Kurd li derveyî welat li hev dicivin. Bi rastî jî civandî û komkirina ronakbîrên Kurd li Ewropa ne karekî hêsan e. Ne 70-80 ronakbîr, du rewşenbîr jî nayêne cem hev, ji kolektîvîzmê dûr in.

Bang û dawetnameya komîteya YRWK'ê ya birêvebir, bala rewşenbîran kişande ser xwe. Ji lew re bi dehan ronakbîran sînor derbas kirin û ji bo beşdarbûna di kongreya 3'yan de roja 25.6.1993'yan, buroya navendî ya yekîtiyê ji ronakbîrên Kurd hatibû dagirtin. Cih teng bû, tîrî hevalên ji bo komcivîna hatibûn, nekîr. Em neçar man ku wan hevalan wê şevê bikin mêvanên welatparêzan, ew şev bûbûn şevê tore, çand, ... Û gotûbêjan.

Bi rastî hîna organîzasyonêke wiha ku bikaribe bersiva pirsên rewşenbîran bide û ji bo ku bikaribin di Tevgera Rizgariya Neteweya Kurdistanê de, derfetên xwe pêşkêş bikin, nehatiye avakirin. Belê, gelek sazûmanî û rêxistin çêbûbûn, di şev û rojekê de hem ava dibin, hem jî tîk diçûn, tenê temenê wan bîst û çar saet bûn, demekê wisa lê hatibû ku, her rewşenbîrekî Kurd bibe sek-

Ev pênc sal in ku YRWK hatiye avakirin. Bêhtirî 150 endamên wê hene, nêzîkî 350 rewşenbîran têkiliyên wan bi yekîtiyê re hene. YRWK xwediyê kapasîteyê gelekî fireh e. Di nav de rojnamevan, nivîskar, lêkolîvan, zimanzan, zanyar û hwd. hene: Vê sazûmaniyê yekîtiya xwe dibînin, di YRWK'ê de ji pîrs, pîrsgirêk û gelsên xwe re çareyan dibînin.

reterê rêxistinekê. Lê ew saziyên rewşenbîrî nikaribûn pîrsgirêkên rewşenbîran çareser bikin.

Ev pênc sal in ku YRWK hatiye avakirin. Bêhtirî 150 endamên wê hene, nêzîkî 350 rewşenbîran têkiliyên wan bi yekîtiyê re hene. YRWK xwediyê kapasîteyê gelekî fireh e. Di nav de rojnamevan, nivîskar, lêkolîvan, zimanzan, zanyar û hwd. hene: Vê sazûmaniyê yekîtiya xwe dibînin, di YRWK'ê de ji pîrs, pîrsgirêk û gelsên xwe re çareyan dibînin.

Tevgera rizgariyê pêşve diçe, gel xwe ji bo serkeftin û serfîzîyên mezin û bi rûmet amade dike. Kurdistan dikeve rewşekê wisa ku şivan û gavanên me di şerê parastina neteweyî de bibin qehreman û egîdên mezin. Rewşenbîrên me neçar in pîrr bi rûmet û rêzdarî li hemerî wan bisekinin.

Di pêvajoyêke wiha hessas de, rewşenbîr dikevîne rewşekê wilo ku, yekîtiya xwe xurt û fireh bikin û bibin himdarên sazîkirina sazî û organîzasyonên xwe.

Kongreyê du rojan dewam kir. Ji hilbijartina dîwanê û heya hilbijartina komîteya navendî û girtinê, platform pîrr ciddî li ser yekîtiyê sekinî. Wiha diyar dibû ku, her kes dixwaze vê yekîtiyê mezin bike û pîrsên wê yê rêxistinî û teknîkî çareser bike.

Mesajên pîrr hêja ji komcivîna re hatibûn hinartin. Ji welat, Tirkiye, Rûsya, Ewropa û gelek welatên din kes, partî û rêxistinên din lêborîn xwestibûn û mesajên pîrozbahî û piştgiriye şandibûn.

Ji nava mesajan, birûsknameya hozan birûmet Seydayê Tîrêj bala min kişande ser xwe. Di mesaja xwe hozanê hêja van gotinan dibêje:

"... Ez gelekî dilteng im ku nikarim di civîna we ya payebilind û bi rûmet de beşdar bibim û bi çavên xwe gelek hozan û nivîskarên Kurdistanê li ba hev bibînim û çend salan ciwan bibim..." Mamosteyê hêja dixwest bi dîtina me û bi beşdarbûna di vê kongreyê de ciwan bibe.

Komîsyonên ji bo standina biryaran hatine çêkirin, 45 kes di komîsyonan de cih girtin. Biryarên gelekî dewlemend hatine standin. Li dawiyê platformê hem ji bo komîsyonên xebatê û ji bo birêvebirina YRWK'ê hilbijartin çêbûn. Hemû hilbijartin vekirî bûn.

Li aliyekî damezirandina Enstîtuya Kurdî, Sazûmaniya Zimanzaniya Kurdî, Yekîtiya Mamosteyên Kurd, Avakirina Pirtûkxaneyê Neteweyî û hwd. û li aliyê din hinartina mesajên ji Serok û gelek saziyên din re. Her wiha wê raporek ji Unesco re jî were şandin, li ser projeya GAP'ê. Vê kongreyê nişan da ku wê di pêşerojê de gelek berhemên hêja werin pêşkêşkirin.

Ji germiya komcivîna ez silavên xwe yê şoreşgerî ji hemû xwendevan û gelê Kurd re dişînim...



DI DEMA CHARLES PASQUA DE PARÎS Li Fransayê nijadperestî dibe siyasetawê. Fransa ji berê ve di mejiyê gelek kesan de mîna warê azadiyê tê zanîn. Di dîrokê de li kîjan welatî kengê kê çî zilm û nexweşî dîtiye, dema bêîmkan maye, berê xwe daye Fransayê û Parîs wek bajarê serbestî û rizgariya biyaniyên belengaz û rewşenbîran pejirandiye.

Bes îro Fransa hêdî hêdî ber bi nijadperestiyê ve diçe û dibe warê dijîtiya biyaniyan. Bi taybetî, ji roja ku Charles Pasqua hatiye serwezîfa Wezareta Karê Hundirîn û vir ve, ev dijîtiya li hember biyaniyan bi awayekî fermî jî xwe nîşan dide. Di wêneyê de jî baş tê fêmkirin ku Parîs nema bajarê serbestiyê ye.

Azerbeycan kete destê Huseynov

Suret Huseynov, di pêvajoya mehekê de tişteki ku ji tu kesî nedihat hêvîkirin, pêk anî. Roja 4'ê Hezîranê serî rakir, di demeke pîrr kurt de hêzên artêşa Azerbeycanê têk birin û dawî parlamento xiste destê xwe. Tevî desteka Amerî Elçibey xwe negirt, ji Baku reviya çû Nexçivanê û dev ji her tiştî berda. Parlamentoya Azerbeycanê jî Suret Huseynov kir Serokwezîr û Serqumandarê Leşkerî, êdî Azerbeycan ne tenê bi fiilî, bi şeklê fermî jî di destê Huseynov de ye.

Nûçeyên Derve- Parlamentoya Azerbeycanê, Suret Huseynov wek Serokwezîr û Serqumandarê Leşkerî hilbijart. Serokê serhildanên ku di 4'ê Hezîrana 1993'yan de li dijî kargêriya Azerbeycanê qewimîn, di 30'yê Hezîranê de ji aliyê parlamentoya ku berî mehekê ew asî îlan dikir ve, wek lehengê neteweyî hate pêşkêşkirin.

Weke tê zanîn Suret Huseynov, pêşî bi çend sed leşkerên asî re li dijî hikûmetê rabûbû, di nav du sê hefteyan de bi hezaran leşkerên din beşdarî nav leşkerên wî bûbûn. Piştî demeke kurt hêzên Suret Huseynov Serokwezîrê Azerbey-

canê mecbûrî îstifayê kiribû. Dawî Ebulfeyz Elçibey jî, ji Baku reviya û hêzên Huseynov dest danîn ser îdare û leşkeriya Azerbeycanê.

Ev serkeftina Suret Huseynov ku qet nebe di demeke welê kurt de nedihat hêvîkirin, ji aliyê endamên parlamentoyê û gelê Azerbeycanê ve tu reaksiyonên neyînî (negatîf) nestandin. Berevajî, tevî nememnûnbûna Amerîka û Tirkîye, Suret Huseynov di 29'ê Hezîranê de parlamentoyê gişt hemû rayeyên îdareya Azerbeycanê xistin destê wî.

Di rûniştina dawî ya endamên parlamentoya Azerbeycanê de Suret Huseynov,

li hember yek dengêki neyînî bi 35 dengên erênî Serokwezîr û Serqumandarê artêşa Azerbeycanê hate hilbijartin. Piştî vê serkeftinê, Haydar Aliyev ku Serokkomariya Elçibey dewr standibû, di parlamentoyê de bi bangekê, Suret Huseynov qehremanê neteweyî îlan kir û da xuyakirin ku, ji bo serfiraziya Azerbeycanê lazim e hemû kes li dor Huseynov kom bibe û pê re bibe yek.

Parlamentoya Azerbeycanê, ji xeynî Serokwezîrî û Serqumandariyê, Wezareten Parastin, karê hundirîn û ewlekariyê jî xistin bin kontrola Suret Huseynov.

Piştî ku bû xwediyê van rayeyan, Suret Huseynov bi axaftinekê bala gelê Azerbeycanê kişand ser hin kirin û niyetên xerab ên Elçibey. Huseynov îdia kir ku Ebulfeyz Elçibey, ji bo zeximandina cihê xwe, bi serokên Ermenîyan re ketiye têkiliyên nependî û hin erdê Azerbeycanê bi zanebûn daye Ermenîyan.

Suret Huseynov komunîstek ji yên dema Sovyetê ye û hîna 35 salî ye.

Festîvala Navneteweyî

Gavan Koçer

Di 26'ê meha Hezîranê de li bajarê Trondheîmê (Norwec) mihîrcaneke (festîvaleke) navneteweyî hat lidarxistin. Ev çend sal in mihîrcanê rengêkî nû û xweşik daye Trondheîmê. serpehatiyeke çandî ya girîngtirîn ku havîna Trondheîmê diavêje rengêkî din. Her sal bi dehan hunermend ji welatên din dikevin rê, beşdarî vê festîvalê dibin. Di vê festîvalê de tangoya Efrîqayê, govenda Kurdan, yoyika Samiyan, muzîka Amêrika Latînî, melodyên Norwecî tenîst tenîst deng didin, gerdûnê biçûk dikin. Deng û awazên cur be cur tevlihev dibin; ji guhan derbas dibin; bi asîmanê re dikevin rê; wek taveke li ser bajara Trondheîmê qor girê didin.

festîval, ji bo ku di warî çandî de li dijî nijadperestî û rasîzmê têbikoşe, pênc sal berê hatiye amadekirin. Wê demê li Norwecê her diçû penaber zêde dibûn û hawirdorên nijadperest û hêzên tarî jî ji bo ku gelê Norwecê li dijî penaberan derkeve xebatên xwe dikirin. Digotin: "Penaber (mültecî) ji welatên kambax, belengaz tên. Ji bo vê yekê tiştên ku ew bidin me nîn e. Ew bi toreyên xwe yên kevnare bi tenê çanda me xera dikin." Ji bo ku rê li van bîrdoz û ramanên paşverû bê girtin, pêwistiya nasîna çandên din ket rojeva hinek kes û koman. Di dawî de biryar hat girtin ku, dê her sal festîvaleke navneteweyî li Trondheîmê bê lidarxistin. Li ser pîrsa "çima Trondheîm?" jî serokê qomîteya amadeyê wiha bersiv da: "Trondheîm bajarê zanîngêhan e, tê de xwendekarên biyanî gelek in, lewma bala Norweciyan kêmkirîne. Bi rastî pênc sal berê kesî bawer nedikir ku, wê temenê festîvalê dirêj be."

Ev sê-çar sal in Kurdên me jî bi çalakîyên xwe beşdarî mihîrcanê dibin û çanda xwe bi gelê Norwecê û gelên din re didin nasandin, armanca doza xwe şirove dikin. Cara yekemîn hunermend Şivan Perwer, dû re

hunermend Zana û Bêrivan û di sala çuyî de jî hunermend Beşîr Botanî bi koma xwe re beşdarî festîvalê bûbûn û bi dengên xwe yên delal folklorê Kurdî rayî temaşevanan kiribûn. Û bala gelek kesan jî kişandibûn.

Norwecî govenda Kurdî nêzî dansa xwe dibînin. Cotê zewicî ku amadekarên festîvalê bûn, di rojnameya Adreseavîsen de hîsên xwe wiha anîn ziman. Di nav dansa Norwecê û hallînga Efrîqayê de xalên (niqteyên) hene, lê dansa me zêdeyî dişibe govenda Kurdî.

Ji aliyê din ve qomîteya amadekarî îsal kovareke magazînî jî amade kiribû û tê de bi dorfirehî cih dabû pîrsgirêk û rewşa welatên bindest û belengaz. Li ser berga kovarê, Kurdistan bi "Kî Kurdistanê tîne bîra xwe" hatibû nûnerandin. Di nav rûpelên kovarê de jî nivîsar bi "Ji bo welatekî serbixwe û azad ev demek dirêj e ku têkoşîna Kurdan didome dest pê dike kovar wênê, bi hevpeyvînan, ku bi zarokên Kurdan re hatine çêkirin, bala xwendevanan dikişîne ser rewşa Kurdan. Wêne ji hêla wênekêşa Norwecî Karolîne Frogner ve hatine kişandin. Frogner di sala 1991'î de piştî jenosîda Sedam çûbû serdana bargeheke penaberên Kurdan. Di vegera xwe de jî wê ji serdana xwe pirtûkekê bi navê "Enlîdelse uten grenser (Êşeke bêdawî)", ku pîraniya wê ji wêneyan pêk tê, pêk anî bû.

Frogner di pirtûka xwe de rexne li dewleta Norwec û NATO'yê digire û bala xwendevanan dikişîne ser domîna têkoşîna Kurdan: Rewşa Kurdan bi tu awayî nehatiye guhertin. Qirîkirin û ji holê rakirina wan didome. Tiştên ku li Kurdên Iraçê qewimîn, herroj li Kurdên Tirkîyê jî diqewimîn. Li Kurdistanê her celeb qetlîamên bêmirovatî tînin ceribandin. Êşeke bêdawî ye, didome. Norwec bêdeng e, dinya bêdeng e. NATO berjewendiyên xwe diparêze, naxwaze qirîkirinê dewleta Tirkîyê bibîne."

Livbaziye memûran deng didin



Memûr ji bo mafên xwe ji pênc milan ber bi Enqerê ve dest bi meşê kirin.

Navenda Nûçeyan- Piştî demeke dirêj a bêdengiyê, karmend (memûr) livbaziye xwe sifit kirin û di riya têkoşîna xwe-dîsendikabûnê de gavên girîng avêtin.

Ji 5 bajarên karmendên ji gelek meslekan ji bajarên xwe ber bi Enqerê ve dest bi meşê mezin kirin. Daxwazên karmendan ji sendikayên karkeran

ji destek dibîne û karker ji beşdarî livbaziye memûran dibin.

Ev meşa ku ji 5 bajarên ber bi Enqerê ve dest pê kir, bi van daxwazan pêk tê: Divê dewlet hemû sendikayan vewendiyî muqaweleye giştî bike. Bêyî ku ferq di navbera karker û karmendan de bê girtin, qanûnekî xebatkar bi giştî bê amadekirin. Şerê ku li Kurdis-

tanê didome bêrawestandî û ber bi riya biratiya gelan ve, çareseriyêke siyasî bête dîtin.

Ji gelek rêxistin, saz û sendikayan, ji bo vî livbaziya karkeran mesajên piştgiriyê tên. Karmend ji bajarên Stenbol, İzmir, Samsûn, Meletê û Mersînê roja 1'ê Tirmehê ber bi Enqerê ve dest bi meşê kirin.

DEP'ê kongreya xwe çêkir



Di Kongreya dawî ya DEP'ê de Yaşar Kaya bi Feridûn Yazar, Ahmet Türk û İbrahim Aksoy re tê dîtin.

Navenda Nûçeyan- Partiya Demokrasiyê (DEP) Kongreya xwe ya Yekemîn a Normal di 27'ê Hezîranê de, li bajarê Enqerê li salona sînemayê ya Kavaklidere çêkir. Di kongreyê de Yaşar Kaya bi 383 rayan ve ji nû ve ji bo Serokatiya Giştî hate hilbijartin. Ji aliyê din ve listeyeke ku 85 navaan pêk hatibû ji bo Meclîsa Partiyê û Heyeta Disiplinê hate pejirandin û ji bo organên rayedar ji listeyeke ji 40 kesî çêbûyî hate qebûl kirin.

Di kongreyê de ji 418 delegayan 403 delege deng dan, ji

rayan 20 jê nelê hate pejirandin.

Yaşar Kaya di axaftina xwe ya vekirina kongreyê de wiha got: "Hemû dorhêlên çep ên Tirkîyeyî, mirovên xwedî bawerî, mebûsên Kurd ên di partiyên din de, hemû kesên ku alîgirên azadiyê ne û dorhêlparêzan ji bo doza demokrasiyê vedixwînin pevçûnê."

Gelek kesên nas ji beşdarî kongreya DEP'ê bûn, mîna Serokê Giştî yê HEP'ê Ahmet Türk, Cigirên Serokê Giştî Hatîp Dicle, Mahmut Kilinc, me-

bûsên HEP'ê Naif Güneş, Sedat Yurtdaş Mehmet Sincar, Sirri Sakik, Orhan Doğan, Remzî Kartal, Selîm Sadak, Zübeyir Aydar, Mahmut Uyanik, ji SHP'ê mebûs Adnan Ekmen, mebûsê kevin ê TİP'ê Tarik Ziya Ekinci, nivîskar Rohat, Mehmet Uzun, Mehmet Bayrak, ji mebûsên kevin Nurettîn Yılmaz, Cumhuriyet.

Kongreya DEP'ê li gorî kongreyên HEP'ê gelek bêdeng buhurî û li ser pêwistiya gelê Kurd û Tirk pir hat peyivîn, girîngiya têkoşîna bi hevreyî hate gotin.

Li Edenê dewlet hate protestokirin

Navenda Nûçeyan- Hêzên dewletê li Edenê ji bo yekîti û baweriyê gelê Kurd bişkênin, cinayetên pêk tînin. Piştî protestoyên kepeng girtinê ku li ser banga ERNK'ê û bi beşdariya hemû esnafên Kurd ve pêk hatibû, hêzên dewletê ji bo bikaribin vî xurtiya gel qels bikin, bi her celeb zilm, girtin û cinayetên dest bi êrîşan kirin.

Di şeva 27'ê Hezîranê de polîsên girêdayîyê Emniyeta Edenê xortekî 19 salî Ahmet Poyraz ku ji dawetekê vedigeriya kuştin. Kurdên ku li Edenê bicihbûne, bersiva vî cinayetê bi protestoyên girseyî dan. Cenazê Ahmet Poyraz bi beşdariya 20 hezar kesî ve, bi dirûşmeyên şoreşgerî û marşa 'Ey Reqîb' hate binaxkirin. Di nava beşdarvanên cenazeyê de parlamenterê HEP'ê Nizamettîn Toğuş jî hebû.

Hêzên dewletê, riyên kolanan girtin û mûdaxelîyê meşvanan kirin. Polîs nêzîkî 50 kesî girte binçav û xwest rê li ber vî protestoya girseyî bigire. Lê tevî hemû rêlibergirtinên hêzên dewletê, nêzîkî 20 hezar Kurd, şehîdê xwe li ala ERNK'ê pêçan û binaxkirin.

Dema ku cenaze anîn Camiya Hebeş, endamê ERNK'ê bi ho-perlorê axaftinek kir û wiha got: "Polîsên Edenê, di armanca berhevdana gelên Kurd û Ereban de ne. Lê ev hewla dewletê vala ye. Lewre ne baweriyê gelê Ereban, ne jî ya Kurd bi dewletê maye. Gelên ku li herêma Çukurovayê dijîn, piştgirên hevûdinin. Îspata vî, ev livbaziya kepenggirtinê ya dawî ye. Hêzên dewletê ji vî livbazi û piştgiriyê re tehemul nişan nedan û Ahmet Poyraz kuştin. Bi vî cinayetê jî hovîtiya xwe careke din diyar kirin."

Cenazê Ahmet Poyraz, li taxa Dağlioğlu li erebeyekê hate siwarkirin û tevî girsên gel ve, ber bi goristana Akkapi ve hate birin. Beşdarvanên cenazê bi lîlandin, slogan û çepikan dewlet protesto kirin. Her ku cenaze nêzî goristanê dibû beşdarên meşê jî zêde dibûn. Li goristanê tabûta Ahmet Poyraz bi ala ERNK'ê hate pêçan û cenaze bi sloganên "Şehîdên Kurdan nemirin", "Bijî Serok Apo", "Bijî PKK, ARGK, ERNK" û marşa "Ey Reqîb" hate binaxkirin. Piştî veşartina cenazeyê li taxên Kurdan esnaf kepengên xwe girtin û vî cinayetê protesto kirin.

Karker ji du aliyên ve têne mêtin

Navenda Nûçeyan- Li Tirkîyê karkerên ku bi sendikayan ve girêdayî ne, hem ji aliyê karbidestan ve hem jî, ji aliyê sendikayan ve têne mêtin. Sendikayên ku peywira wan parastina mafên karkeran e, bi giştî ew jî dikevin nava refên mijokdaran û bi pereyên karkeran xwe dewlemend dikin.

Bi milyonan karker, her meh hinek ji meaşên xwe didine sendikayên xwe û bi trîlyonan pere di sendikayan de dicivin. Armanca di dema grevan de, karker bêpere nemînin û bikaribin jiyana xwe bidomînin. Lê sendikayên li Tirkîyê bi van pereyên ku li cem wan dicivin, li dû dewlemendiya xwe digerin û bi pereyên karkeran jiyaneke dewlemend diborînin.

Ji bo vî yekê mînakê herî dawî, Sekreterê Giştî yê Konfederasyona Türk-İş'ê Şemsî Denîzer e ku, wek serokê karkerên komirê tê nasîn. Şemsî Denîzer bi pereyên karkeran, jiyaneke lûks û dewlemend diborîne ku li Tirkîyê bi zor kapitalîstîk dikaribe weke wî bijî. Şemsî Denîzer heta niha bi gelek kirînan xwe deşîfre bûbû û rûyê wî yê rast derketibû holê. Lê ev bûyera dawî, ew di rojnameyên burjuvaziye de jî derxiste manşetan. Bi rojan li ser hate nivîsandin û televizyonan qala wî kir. Çi kiribû Şemsî Denîzer? Ji xwe re erebeyek standibû, belê marqeya erebê Jaguar û buhayê wê jî 2 milyar lirayê Tirk bû. Axayên sendikayên din jî, li dijî vî yekê der-



Şemsî Denîzer

ketin. Lê beyanên Şemsî Denîzer ew jî deşîfre kirin. Li gor Denîzer di depoyên her yek ên ku wî rexne dikin de, erebeyên luks hene marqeya hemûyan jî Mercedes e û tu yek ji wî kêmtir ne di nava lûksê de ye. Ev beyan rûyê reş ên hemû axayên sendikayan êşkere kir û niha her yek di cihê xwe de dixwaze ser vî bûyerê binixume da ku pîsîtiyên wan bêhtir demekeve holê.

Jixwe demek berê, serokê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan, di hevpeyivîneke xwe ya ku di Özgür Gündemê de hatibû weşandin de, li ser vî yekê rawestiyabû û dabû xuyan ku divê li hember van axayên sendikayan weke têkoşîna li hember cerdevaniyê, têkoşîna bête dayîn. Lewre ew bi xwe xayînen çîna xwe ne û peywira wan parastina dewletê ye.

Di germiya şoreşê de Komcivîna YRWK'ê ya 3.


Selîm Biçûk

Di beyana roja 26.6.1993' yan de, ev beyana ku pergînî gelê Kurdistanê dihat û kîn û nîfrîna wî li ser qirkirin û hovîtiya dagirkeran vala dikir. Ne rojeke mîna hemû rojan bû. Roja tolhildanê bû. Li welat û derveyî welat. Êdî her kesî agirê dilê xwe vedimrand. Di vê beyana pîroz de û di bin dirûşmeya: "Rewşenbîriya Kurdî bi yekîtiya neteweyî geş dibe" de ronakbîrên Kurdistanê Kongreya xwe ya Sêyemîn vekirin. Rewşenbîrên welatparêz ên ji çar parçeyên Kurdistanê li bajarê Bonnê kom bûbûn. Kongreya YRWK'ê ya sêyemîn, piştî kêliyeke bédengiyê li ser giyana şehîdan dest bi kar û barên xwe kir. Berpirsiyarê YRWK'ê bi peyvên xêhatinê pergînî mêvan û endamên beşdar hat. Bi germiya dilê şervanên azadiyê û sersotka berxwedanê serkeftin ji bo kongreyê xwest da ku bigihîje hevî û amancên xwe û bersiva

demê bide.

Ji bo kargêriya kongreyê diwanek ji 5 kesan hat hilbijartin. Beşdarên xwe bi hev dan naskirin. Pişt re bi awayekî berfireh rewşa siyasî ya dawî hat nixandî û rola ronakbîran di vê koçbera dîrokî de hat şîrovekirin. Ji gotûbêjên ku di vê hêlê de çêbûn ev in: "... Cara yekemîn e ku gelê me di dîroka xwe de digihîje yekîtiyeke neteweyî...", "... Ne tenê li Kurdistanê lê belê Rojhilata Navîn û cîhanê jî, dê guherîn û pêşveçûn bi însiyatîfa gelê Kurdistanê werin pêkânin...", "... pêwîst e, rewşenbîr mîna şervanekî li ser çiyên bibe gulleya serkeftinê..."

Mesajên ku ji kongreyê re hatibûn, hatin pêşkêşkirin; ji van mesajên: Girtiyên PKK li Dusseldorfê, endamên Meclisa Neteweyî li Sovyeta Kevin (Çerkezê Reş, M. Silo (Babayêv), Nadir Nadirov, Ezîz Ziya, Wekîl Mustafayêv, Yora Nebiyêv, Ordixanê Kaşaxî, Şerêfê Eşîr û Zîrbê İbo),



Komcivîna YRWK ya sêyemîn bi beşdariyeke xurt dest pê kir û li gor germiya şoreşê biryarên girîng hatin girtin.

Ji Navenda Çanda Mezopotamya Şefîq Beyar, Huseyn Kaytan û İbrahîm Gürbüz, Xebatkarên rojnameya Welat, Feyka Kurdistan, Berpirsiyariya YN li Ewropa, RNK-KUK, Heyva Sor a Kurdistan, Berpirsiyariya ERNK li Rûsya, Hevgirtin, HEV-KOM-Parîs, YJWK Ewropa, Cewad Mela, Ezedîn Naso, PR. Marxeznedar, Reûf Hesên, Mumtaz Heyderî, YEKMAL Kurd, Ahmed Şerîfî û gelek kes û saziyên rewşenbîrî û siyasî yê din. Piştî mesajên bi raporekê kar û xebata YRWK'ê ya 2 salan hat nixandî û raporên şaxên Berlînê, Swêd û Fransa hatin xwendin û nixandî. Raporên Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK) û Yekîtiya Xwendevanên Kurd (YXK) û ya maliyê jî hatin xwendin. Komîsyonên xebatê hatin çêkirin û bi karên wan, karê kongreyê xwe dirêjî saet 12 şevê kir. Di dawîya xebata roja yekemîn de, çend ronakbîran dîtinên xwe wiha pêşkêş kirin: Mamoste Fêrgîn Melîk: "... Îro di vê pêvajoyê de kongreyêke wiha tiştêkî pêwîst e ku li dar dikeve. Çareserkirina gelek pirsan û bikaranîna wan di jiyandê de dibê serkeftina kongreyê. Ji bo vê jî girîng e her kes ji me niha û piştî kongreyê jî karê xwe bike... Bi rastî li gorî têkoşîna gelê Kurdistanê, rewşenbîrên Kurd pîrr li paş mane. Li pey şoreşê dimeşin, berevajî şoreşên cîhanê, rewşenbîrên Kurd li pişt şoreşa xwe dimeşin. Lê pêwîst e em bibêjin: Gelek rewşenbîrên me bi temamî wezîfeya xwe pêk anîne û şehîd jî ketine. Pêwîst e em nîşan bikin ku, em laîqî wan şehîdan in, laîqê şoreşa xwe ne û dixwazin di bin vî barî de bigihîjin."

AXAFTINÊN BEŞDARAN

A. Balî: "Girîng e di her alî de ronakbîrên Kurd karê xwe pêşve bibin. Yekîtiya xwe fireh

bikin, ji hêla din ve ronakbîr di xizmeta gelê xwe de be û yekîtiya hêzên siyasî biparêze û bi awayekî biratî dijberiyên çareser bike, daxwaza me jî serkeftina vê kongreyê ye... Roj bi roj asteng ji pêşiya gelê Kurd radibin, hêzên siyasî jî ber bi yekîtiyê ve diçin..."

Şair Gundi: "Îro kongreyê dest pê kir. Rewşenbîrên ku beşdar bûne, bi dorfirehî li ser pîrr pîrsên girîng û li ser kêmasiyan sekinîn. Bi hevaltî û çavekî rexnevanî dixwestin van pîrsgerikan bi şeweyekî rêk û pêk çareser bikin. Em hêvîdar in ku, ev kar hîn bi şeweyekî xurttir pêşve here..."

Husên Qertal: "... Kar û barê îro, heta saetên dawî hîn baş nehatibû fêmkirin, lê di şûn de piştî mudaxeleya diwanê hinekî ket rêzê. Ez bawer dikim sibê dê baştir be. Pîrsgerîka me Kurdan tim li ser tiştên ku li ser diaxivin namînin. Her tiştên xwe em top dikin û dibêjin, ew jî, ji ramana jar (zayif) tê..."

Mamosta Amed Tigrîs: "... Di kongreyê de hin pîrsgerîkên ziman hebûn, ji ber ku rewşenbîr ji her derên Kurdistanê hatine. Derî vê, kongre baş diçe..." Mamosta Emîn Akbaş: "... Di vê kongreyê de ez tiştên nû û balkêş dibînim. Beşdarbûna ronakbîrên nû pîrr e. Ez bi vê pîrr kêfxweş dibim. Tiştên ku kongre li ser radiweste jî, pîrr pêwîst in û hêvîdar im ku biryarên baş bînin standin da ku em bikaribin bersiva demê bidin..."

Her wiha piştî rojeke dagirtî kar û xebatên beşdarên kongreya YRWK'ê ya Sêyemîn xwe amade dikin ji bo roja duyemîn û li pêşberî wan serkeftine.

ENSTÎTU, PIRTÛKXANE Û WEQFA KURDÎ

Piştî rojeke tije, ji gotûbêjên dorfireh û nixandîna xebatê jî her hêlê ve roja duyemîn ya

kongreyê seranser bû roja standina biryarên hêja û balkêş. Biryarên ku di jiyandê de bingeha komara neteweyî danîn (deynin). Ji van biryaran:

1. Avakirina Enstîtuya Kurdî ji bo lêkolînên dîrokî, çandî, zimanî, toreyî, civakî, ramiyari û her beşên lêkolînan

2. Avakirina Pirtûkxaneya Neteweyî û Weqfa Çanda Kurdî. Ji bo civandin û parastina pirtûk, meteryal, arşiv û hemû nivîsarên li ser Kurd û Kurdistanê, biryara avakirina pirtûkxaneyê hat standin. Her wiha ji bo peydekirina çavkaniyêke diravî ya bêrawestan û birêvebirina saziyên çandî, hunerî, tendurustî... hwd. Weqfa Çanda Kurdî hat avakirin.

3. Avakirina komîsyoneke weşan û çapemeniyê ji bo dewamkirina weşanên "Rewşen" û alîkirina Rewşen a NÇM'ê, rojnameya Welat û hemû weşanên welatparêz ku li welat tînan weşandin.

4. Avakirina sazûmaniya zimanê Kurdî ji bo birêvebirina xebatên rêzimanî, ferhengî û hemû babet lêkolînên li ser zimanê Kurdî bi hemû zaravayan ber bi avakirina zimanekî yekgirtî.

5. Bi fermî avakirina Yekîtiya Mamosteyên Kurd "YMK", ji bo vekirina dibistanên Kurdî li Ewropayê û amadekirina pirtûkên dibistanan û birêvebirina xebatên li ser perwerdekirina zarokan.

Ji bo komîsyonên birêvebir ên van saziyan bêhtir ji 30 ronakbîrî hatin hilbijartin.

Û her wiha gelek mesaj û raporên din tînan hinartin.

Di dawîya kongreyê de Komîteya Navendî ya (YRWK'ê) bi awayekî demokratîk hat hilbijartin. Lê berî vî jî bo ku YRWK xwe bi kûrahî û firehî mezin bike; li ser destûrê hat rawestandin û gelek tiştên ku bersiva demê nedidan hatin guhertin.

Daxuyaniya YRWK'ê

Kongreya Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan -YRWK- ya Sêyemîn, di rojên 26-27.6.1993'yan de, li bajarê Bonnê pêk hat. YRWK di kongreya xwe de gelek biryarên girîng girt û hin saziyan ava kir.

Di kongreyê de li ser rewşa Kurdistanê û wezîfeyên rewşenbîrî bi firehî hate sekinandin. Rewşa welat û rewşa bûyerên dawî di bin çav re hate derbas kirin û pêwîstî bi vî daxuyaniyê ve hate dîtin.

Tevgera azadî û rizgariyê ji destpêka Newroza vî salê ve dest bi rawestandina şer kir ku, rê li ber aştiyê vebe û pîrsa Kurdistanê bi rêka siyasî çareser bibe. Flawestina şer nêzîkî 2 mehan kişand û di nav van 2 mehan de ji aliyên gerilayên Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê ve agir nehat kirin. Li gel vî diipaki û destê aştiyê jî aliyê Kurdan ve, dîsa jî dewleta Tirk ya dagirker agir nebîrî, bi ser ve jî şerêkî hê dijwartir, li hember gelê me da ajotin. Gelê me tu riyekê û çareyekê li dijî vî politîkaya dijmin nedît, ji bilî ku, careke dinê dest biavê çekan û xwe biparêze. Tu kes nikare, li hember xweparastina gelê me û artêşa me bisekine û berpirsiyarên xwîrrijiyê tenê dewleta Tirk e.

Dijmin welatê me wêran dike, qetliamên mezin çêdike û dixwaze şerê taybetî li her cih û bi her awayî bimeşîne. Li Rojhilata Navîn bi dewletên din ên dagirker re li hev tê û di êrişên xwe de sînoran nas nake, başûrê Kurdistanê jî bombebaran dike.

Ji aliyê din ve TC (Komara Tirkiyê) li Ewropayê jî xwedî planên taybetî ye. Dixwaze şerê xwe yê taybetî li Ewropayê bi destên dewletên Ewropî bide ajotin. Gelê me yê ku li Ewropa dijî, van listîkan baş dizane û heqê wî heye ku, xwe li dijî vî politîkayê biparêze.

Gelê me gelek aştiyxwaz e, lê dijmin nahêle ew di nav aştiyê de bîji. Ew jî divê bikaribe mafê xweparastinê bi cih binê. Di vî warî de kar û bar dikeve ser milê me rewşenbîran. Em bi her awayî bi gelê xwe re ne. Daxwaza gelê me daxwaza me ye.

Gelê me bi zar û zêç, kal û pîr, karker gundî, xwendekar û rewşenbîr û hemû beşên civakî, xwe li her derê li dijî tunekirinê biparêze, têkoşîna xwe ya azadî û serxwebûnê geş bike.

Em pîrozbayî li hemû kes, partî û rêxistinên Kurdistanê, yê yekîtiyxwaz dikin; banga me jî gişan re ev e: Yekîtiya neteweyî bi eniyêke neteweyî xurt bikin û bi her awayî, di her rewşê de, li ba gelê Kurd cih bigirin. Piştigiriya çalakîyên gelê me, piştigiriya artêşa Kurdistanê bikin.

Em bang li hemû rewşenbîrên din jî dikin ku, gelê xwe tenê nehêlin, li ba têkoşîna wî bin. Divê em bi her awayî li dijî dijmin, bi gelê xwe re rawestînin, gavên pêşveçûnê xurt bikin.

Bijî têkoşîna gelê Kurdistanê!
Bijî yekîtiya neteweyî!

YRWK / 27.06.1993

Neq



Ger we hêza ramanê bisînor kiribe
wey li halê we! Hingê we gelek tişt di
têkoşîna mirovahiyê de winda kirine.

Abdullah Öcalan

Şimdi

Rojê yew (jew) qeza Heqarî ra 2 cendirmey, qandê celban şonê dewandê dormî (çorşmî). Cendirmey xeylê (epex) qereqol ra dûrî kuwenê. Rojana rojê do omnanî yo. Roj ver bi taştarî şono. Kelkela. Yew Şiwane (Şone) zî coldê pezî verdo. Namê Şiwani Şemdîn o. Şiwane tek qali Tirkî fam nêkeno. Şiwane hêdî hêdî pezê xwi (xo) ver bi dew beno. Şiwane ray hewniyeno ki di hebî cendirmey cor di yenê. Hama rew keno kardî û qutiya titûndê xwinê qacaxî bindê yew lem ra keno limneno (nineno). Cendirmey ki gorebê se-disey (100-200) mitro nîzdîkê Şiwani bî. Şiwane hewniyeno ki cendirmey xwi miyan di qali kenê venê:

- Şimdi burdan köye gidece-giz. Şimdi göreceksin muhtar bize ne yemekler hazırlıyacak. Şimdi yine geri geleceğiz. (Ma enkay ewta ro şonê dew. Ti veynenê muxtar ma rê enkay çî nan hedimeno. Ma enkay rana peydi agêrenê). Şiwane qalikerdişê cendirmanana tenê "Şimdi" fam kenê. Tersana qitê Şiwani qerifiyeno. Xwi pîze di vano: "Xule miheqeq fermanê mi vejî-yawo. Enê cendirmey heytiya vanê Şemdî. Şemdî." Ki cendirmey jê ra dûrî kewtî şî hetê dew ra. o zî colê pezê xwi beno nîzdîkê dew, keno rayîdî ser. pez bêwahîr şono dew. O zî rayna pey di agêreno ver a



xwi dano hetê koy ra. Dewijî hewniyênê ki colê pezî ha cor di yeno. lakim Şiwane dim a niyo. Xeylî wext nabên ra vîreno (ravîreno). dewijî hewniyênê ki Şiwane dew cay niyaseno. Naşt-daşt vengano dekuweno dew miyan vanê:

- Xule Şiwane ma miheqeq cay yabana çiyê biyo. Çend dewijî terey kuwenê şonê ko, qando ki Şiwane dew bigêrê. Xeylî wext ra pey, dewijî ko di veyndanê veyndanê. welhasil Şiwani yew şeqal di veynenê. Dewijî Şiwani ra vanê:

- Lila Şemdîn! Qey xêro, ti nêweş mêweşî çiyê? To colê pezî bêwahîr raştkerdo keye? Şemdîn vano:

- Nê. Ez nêweş mêweş niya. Lakim di cendirmey cor di amaynê hetê dew ra, heytibiy qalikerdişê xwi di vatê şemdî, şemdî, şemdî. Ez tersaya. Mi va xule miheqeq fermanê mi vejî-yawo. Enê cendirmey amê ki mi berê. Co ra ez remaya. Mi va ez xwi bilimna.

Dewijî yewini ra hewniyênê, hiwenê vanê:

- Lila Şemdîn, Homa to nêgiyo. Cendirman bahsê to nêkerdo. "Şimdi" bi Tirkî yanî enkay yo. Cendirmey qandê celbdê esker arêkerdişî amê kê dê muxtarî. Şemdîn û dewijî tereydi agêrenê şonê dew.

Mihem Himbelij

Jûjî...

Doğan Güzel



TÎR



Musa Anter

Xwîna Kurd erzan e!

Pelê gulan dikan
Mûman vedimirînin
Dayîk û minalan
Dikin kêlên qurşinan
Cejn û şahiyân
Diavêjin bin zincîrên tanqan
Dixwazin bihar neyê Kurdistan
Kurd bimîne pezê bêşivan
Helebçe dane ber bombeyan û gazan
Şirneq hilweşandin bi balefir û topan
Di xewnên me de tirs û tarî
Di çêrûkên me de xem û dijwarî
Nûçeya teze: Kuştin
Nûçeya tezetir: Kuştin
Nûçeya tewra teze: Kuştin
Gund û bajaran
Jin û mêran
Minal û kalan dikujin
Nivîskaran dikujin
Rojnamevanan dikujin
Musa Anter dikujin
Dikujin... Dikujin
Bêhejmar dikujin
Weke baranan
Hêstirên Kurdan
Gelê me xemgîn
Bi hesret û axîn
Kî dihejmêre hêviyên gornekirî
Kî dihejmêre destên jihevkirî
Kanê derman bo birîndaran
Kanin nan bo sêwiyan ber diwaran
Kanin tevr û bêr ji bo veşartina kuştîyan
Kanin kefenên ji bo hezaran
Di dilên me de doza welat
Di devê me de doza welat
Di guhên me de doza welat
Di xewnên me de
Di xewnên rojan û şevan de doza welat
Ken û şahî kuştin
Jiyana şîrîn li me tal kirin
Kerba dilê neweyan
Xezeba çîyan
Kêr giha heştî
Kêr giha heştî
Şehîdên nas û nenas nîşan didin:
"Hemû qeyd wê werin şikandin
Sînoren dijmin va tén çirandin"
Zarokên xas û tazî
Pîrejînen heftê-heştê salî
Li her alî
Destan radikin: Viktorî... Viktorî
(Serketin... Serketin)
Gelî kûr in
Çiya bilind in
Fireh e welat
Fireh e welat
Ji nav tariyan
Ji nav dûmanan
Dengekî zelal derkete meydan:
"Ev doza me ye
Welatê me ye
Namûs e, namûs
Namûsa me ye"
Hemû gel bi hev re:
"Namûs e namûs
Namûsa me ye"
Ev gelê kevnar
Wek alaf û ar
Bi yek deng û qêrîn:
"Namûs e namûs
Namûsa şîrîn
Musayê Anter sed car aferîn
Aferîn her dem ji bo navê zêrîn
Bersiv jî heye
Bi dilê te ye
Li her der serhildan
Li her der serhildan"

Têbinî: Ev helbest roja şemiyê, di 26.9.1992'an de, di civîna serxweşiyê de, ji bo welatparêzê mezin Musa Anter li Berlinê hate xwendin.

Helbestvan: Gundî Dilberz

Li dij daxwazên gelê Kurd, dewlet dev ji darê zorê bernade. Gel jî, ji bo bidestxistina mafên xwe, li nik gerîla tédikoşe û her diçe:

Şer radiperike

● Dewleta Tirk siyaseta xwe ya li hember pirsgrêka Kurd û Kurdistanê naguherîne, tevî hemû guherînên şekî metodên xwe yên klasîk û leşkerî bi kar tîne. Hemû rayedarên Tirkîyê baş dizanin ku ev metod û navgînên leşkerî di çareserkirina pirsê Kurdî de bi kêrî tu tiştî nayên, bes kesek jî newêre vê siyaseta çewt biguherîne, giş vê pirsgrêkê dispêrin artêşê û li gor berjewendiyên xwe yên şexsî dewletê idare dikin.

● Tevra dewletê ya dawî di dema şerrawestina PKK'ê ya yekalî de careke din bû sebeb ku PKK jî nû ve şerê çekdarî li hember dewleta Tirk bide destpêkirin. Niha ev şer di her warî de germ û geş dibe. Bi pêşengiya PKK'ê Kurdên welatparêz li her derê çî ji destê wan tê dikin û dewleta Tirk dixin nav rewşeke xedar. Vêga êdî ne Kurdên li Kurdistanê, yên li hemû deverên dinyayê desteka xwe didin PKK'ê û li hember dewleta Tirk di warên cur be cur de têkoşîna neteweyî bilind dikin.

Navenda Nûçeyan- Têkoşîna neteweyî ya gelê Kurd, ji 8'ê Hezîranê, roja jî nû ve destpêkirina şer ve bi awayekî pîrr tund û pêldayî xwe diyar dike. Li aliyekî êrişên gerîla hemû herêmên bakurê Kurdistanê bi taybetî jî li Botanê roj bi roj zêdetir dibin, li aliyê din gel bi protesto û girtina kepeng û kontaxan li hemû bajarên Kurdistanê û li çend bajarên Tirkîyê û Ewropayê jî desteka xwe dide şerê gerîla.

Wekî din bi protestoyên ku Kurdan li gelek bajarên Ewropayê li dar xistin, dengê têkoşîna gelê Kurd bi firehî bala raya giştîya dinyayê kişande ser xwe.

Di vê meha dawî de, di rewşa cerdevanan de jî guherînên girîng xwe nişan didin. Bi hezaran cerdevan dixwazin dev ji cerdevaniyê berdin û tevî ku dewlet rê nade wan, dîsa jî gelek ji wan tivingên xwe diavêjin hewşên tabûr û qereqolan. Cerdevanên zêde bi dewletê ve girêdayî jî, jixwe jî êrişên gerîla yên pîrr dijwar para xwe distînin.

Tenê di vê hefteya dawî de bi sedan êrişên gerîla li Kurdistanê pêk hatin. Li bajarên Tirkîyê yên wek Edene, Mersîn, Stenbol jî piştgiriya têkoşîna gerîla, ji aliyê gelê Kurd û Tirk yê şoresger ve bi awayên cur be cur tînin li dar xistin. Bala raya giştî ya dinyayê jî bûyerên dawî yên li balyozxane û sazîyên hate kişandin. Helbet hêzên dewletê jî di vê navê de hovîtiyên xwe didomînin û ji bo rawestînadina raperîna têkoşîna gelê Kurd, kirinên dijminahiye dîsa pêk tînin.

Ev heftî êriş û cerdên gerîla zêde bûn. Hêzên dewletê li hember van gelek gund şewitandin, kirin ku ji nexşeyê bîr avêtin. Di vê navê de roj bi roj îstifayên cerdevanan jî zêde

bûn, protestoyên gel li hember qirçirînên Kurdistanê bi girtina kepengan dom kir. Protestoyên kepengirtinê gihîşt ta bi Stenbolê.

25 Hezîran 1993: Gerîla li ser riya di navbera Mûşê û Pasûrê (Qulp) de nasnameyan kontrol kir. Di vê navê de erebeyên şantiyê yên riyabêjê şewitandin. Gerîla kontrolkirina nasnameyan li ser riya Çepekçûr (Bîngol) Mezrayê û (Elezîzê) domandin.

Li Licê gerîla avêtê ser mewziyên cendirmeyan, di şer de gerîlayek û gelek leşker hatin kuştin.

Li Stenbolê kepeng hatin girtin. Li tanga Küçükköy ku li ser navçeya Gazîosmanpaşa ye, esnafan jî bo protestokirina qirkirinên li Kurdistanê kepengên xwe girtin. Polîs hin esnafan girt bin çav.

Hêzên dewletê Licê dan ber gulleyan. Gel jî bo xwe biparêze şevê di stargehan de derbas kirin.

26 Hezîran 93: Ji gundên Ayir, Baştazir, Xaciyar, Weregöz, Bestk, Taşyazi ku li ser ser navçeya Geverê (Yüksekova) ya Cûlemêrgê ne 140 cerdevan dev ji cerdevanyê berdan.

Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser Tebûra Qumando, qereqol û lojmanên polîsan ên li navçeya Bişêriyê ya Batmanê. Di vê cerda gerîla de 10 leşker û polîsek mirin.

Gerîla li Bazîdê ereba Timên Taybetî dan ber gulleyan. Tîmek mir yek birîndar bû.

Piştî ku gerîla avêt ser mewziyên cendirmeyan û ew xesirandin, hêzên dewletê berê xwe dan gundên der û dor û ew jî binî ve şewitandin. Gundên hatin şewitandin li ser navçeya Licê: Pêçar (Guldiken), Hesîgê (Hesîk) û Bawerdê ne.

Li Edenê kontgerîla xortekî bi navê Ahmet Poyraz (19) kuşt.

27 Hezîran 1993: Hêzên dewletê dev ji şewitandinê gundan bernadin. Xegnî, Zîktê, Prîsk, Norşîn, Maştak, Gozorik û Şêxmûs şewitandin. Kesên ku li gundên hatin şewitandin rûdiniştin, çûn cem mirovên xwe yên gundên der û dor hin jî derketin serê çiyayan.

Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser qereqola gundê Dembe (Düzyamaç) ku li ser navçeya Navşan (Şemdinli) a Cûlemêrgê ye. Qereqoleke ku nû hatibû avakirin bi temamî şewitandin. Gerîla li Misircê (Kurtalan) Nexweşxane û li Batmanê jî Tekelê şewitandin. Li gundê Ciralî ku li ser Dêrsimê ye gerîla avêt ser qereqolê, 5 leşker kuştin.

Li Sasonê 32 cerdevan dev ji cerdevaniyê berdan.

Li Bazîdê gerîla dema di rê de nasnameyan kontrol dike, erebeyek bi lez jî herêmê dûr dibe, gerîla jî wê dide ber gulleyan. Polîsek dimire yek birîndar dibe.

28 Hezîran 1993: Gerîla li Şirnexê li ser riya di navbera gundên Şaxareş û Sîslîce de nasnameyan kontrol kirin. Di vê navê de tesbît kirin ku Sercerdevanê gundê Kumçatî Reşîr Demîr, bi traktorên xwe avê ji radyolînga PTT'ê ya Çiyayê Gebarê re dikişîne.

Gerîla dest datînin ser 4 traktorên û sê şofêr jî bi xwe re dibin. Li ser vî awayî firok (helikopter) wê herêmê bombebaran dikin, 3 şofêr û gerîlayek tînin kuştin. Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser qereqola gundê Keçelî ku li ser navçeya Gever (Yüksekova) a Cûlemêrgê ye, 4 leşker û 2 serbaz hatin kuştin.

Melazgîrê jî, ji bo protestokirina qirkirinên Kurdistanê ke-

pengên xwe girtin. Şoferên jî qontaxên erebeyên xwe qefaltin.

Gerîla li ser riya di navbera Qaqizman û Karakurtde kemîn danî, serbazek û 5 leşker mirin, 5 leşker jî birîndar bûn. 6 jî gerîla hatin kuştin.

Gerîla êrişî Tabûra Cendirmeyan ya gundê Güzeldere ku li ser navçeya Darahênê (Genç) ya Çepekçûrê (Bîngolê) ye, kir, 2 leşker mirin.

Îstifayên cerdevanan didomin. Ji gundê Azêke ku li ser navçeya Misircê (Kurtalan) ye 3 cerdevan xwestin îstîfa bikin, lê daxwaza îstîfakirina wan nehatê qebûl kirin. Li ser vê yekê sîlehên xwê danî baxçeyê qereqolê û çûn. Hêzên dewletê ev hersê cerdevan girtin bin çav.

Ji gundên Yarimkaya û Panamerik ku li ser navçeya Özalp ya Wanê ne, 30 cerdevan îstîfa kirin.

Gerîla muxtarê gundê Kuru-dere ku li ser navçeya Çalê (Çakurca) ya Cûlemêrgê ye, revandin. Bi vî awayî jî vî gundi 16 cerdevan dev ji sîleh berdan.

29 Hezîran 1993: Hêzên dewletê gundê Rîz û Pîroz ku li ser navçeya Darahênê (Genç) ya Çepekçûrê (Bîngol) ye şewitandin.

Gerîla avêt ser Tabûra Cendirmeyan a Îkîzce, 6 leşker mirin 8 birîndar bûn. Piştî vê bûyerê hêzên dewletê gundê Îkîzce dan ber gulleyan û agir, 3 gundi mirin û 6 jî birîndar bûn.

Panzerek Tabûra Cendirmeyên Zevê li mayînen ku gerîla raxistibûn qelibî û îhma bû, 8 leşker mirin. Firoka (helikopter) ku li Şirnexê bi hewara leşkeran ve hat, jî aliyê gerîla ve hate daxistin.

- Gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê li hêla navçeya Mûtîki ya Bilîsê li hev dan, 3 tîm mirin û gelek rojnamevan birîndar bûn.

Li Mêrdînê di riya navbera Kerboran (Dargeçit) û Midaydê de panzerek malê Rûs li mayîne qelibî û îhma bû.

Cerdevanên gundê Boşatê (Boyunlu) di rê de otoboseke ku diçe Badika, didin sekinandin û 30 rêwiyên wê direvînin. Cerdevanan vê, ji bo ku lêzimên wen ên jî aliyê PKK'ê ve rehînan hatine standin, bîr berdan dikin.

Gerîla û hêzên dewletê li hêla navçeya Çermükê ya Amedê li hev dan, leşkerek mir, 4 birîndar bûn. Gerîla 2 cerde-

vanên ku ketibûn şer, revandin.

30 Hezîran 1993: Gerîlayên ARGK'ê bi roketavêjan avêtin ser tabûra cendirmeyan a gundê Îğneli ku li ser navçeya Perwarî ya Sêrtê ye, serbazek û 12 leşker mirin 8 birîndar bûn. Di vî şerî de 8 gerîla jî hatin kuştin.

1 Tirmeh 1993: Gerîla avêt şer qereqola gundê Herfasê ku li ser navçeya Qubîne (Beşîrî) ya Batmanê ye, nayê zanîn çend leşker mirine, bes li gor nûçeyên ji herêmê tînin gelek leşker di lihevaxistinê de mirine. Gerîla riya Şirnex û Darahênê girtin, 3 leşker mirin. Cerdevan û hêzên dewletê li hêla navçeya Şaxê (Çatak) ya Wanê ketin kemîna gerîla 3 cerdevan mirin, 2 leşker birîndar bûn. Ji ber qedexekirina çûnhatina herêmê, zaiyat nayên zanîn.

Gerîlayên ARGK'ê yên bajêr li Edenê li taxa Mîthatpaşa bombe avêtin trafoya elektrîkê û trafoyê rûxandin.

Piştî ku berî vê bi rojekê, li Edenê tîmekî taybetî hate kuştin, hêzên dewletê bêhedef taxên ku Kurd lê dijîn dan ber gulleyan. İmran Talayhan, Ekrem Parsak, Muzaffer Koç, Mehmet û Menduh Çakir hatin binçavkirin.

Cerdevan li gor bangên ARGK'ê dev ji wezîfeya xwe berdidin. Walîti vê daxwaza wan qebûl dike, lê navendên hêzên leşkerî qebûl nakin û zordestiyê li wan dikin. Cerdevanên gundê Kuferdel ku li ser Mêrdînê ye, îstîfa kirin lê qereqola gund qebûl nekir. Li ser vî awayî cerdevanan serî li walîtiyê dan. Walî Yahaya Gur van îstîfayan qebûl dike bes hêzên leşkerî li hember vê derdikevin.

Li gundê Ertoş ku li ser navçeya Çalê (Çukurca) ya Cûlemêrgê ye, 40 cerdevan û yên gundê Zêwkan ku li ser navçeya Navşanê ne dev jî vê wezîfeyê berdan.

2. Tirmeh 1993: Gerîlayên ARGK'ê di êrişê ku birin ser navenda Çeleyê de avahiya qeymaçem û şantiya "Köy Hizmetleri" bi temamî tahrîp kirin ku zerara doringî li dora 15 milyar lirayî ye.


Eynî roj, 8 heb tîmên taybetî li Şirnexê di kemîniyêke gerîla de hatin kuştin, 9 cerdevan jî dil hatin girtin.

Li Sasonê gerîlayan girtin ser Qereqola Herendê, 6 leşker birîndar kirin.

Namekey Bîl Klinton bo Saddam Husên



Bîl Klinton: Twanay casûsiy Êraq man şel u god kird



Saddam Husên: "Klinton bekrêgîrawiy zayonizme"

Navenda Nûçeyan- Rojîy şemmay rêkewtiy 26.6.1993 Amrîka hêrişiy kirde ser Bexday pêtextiy Êraq. Wezaretiy Bergiriy Amrîka "Pintagon" raygeyand ke 23 muşegiy coriy Tomahok le keştigeliy kendaw u zeriya sûr gîrawnete şariy Bexda. Sibeyne zûy yekşem 20 muşeg lemaney pêşû le "Komelgey Muxaberatiy Giştîy" y Bexda kewtnewe. Lem 20 muşeg teniya 16'yan nîşaniyan pêka u dezigay nawbirawyan wêran kird. Sê muşegiy tir le rojaway komelgey pêşû kewtnewe u ziyaniyan le awedaniy ew şuêna da. Rêjîmiy Êraq gutiy teniya 8 kes bo hoy em hêrişewe kujrawin.

Serçawekaniy Koşkiy Sipî rayangeyand ke em hêrişey namay Waşintone bo ew wilataney haniy têror deden. Serok Klinton rojîy dîşemme 28.6 diway em hêrişey Amrîka bo ser Bexda gutiy, "Ême twanay casûsiy Êraq man şel u god kird." herweha gutiy "Pêwîste têroristekaniy tiriya diniya baş

bizanin ke wilate yekgirtuwekaniy Amrîka le beramberiy ewanda dest naporêzê." Le rastîda em axawtiney Bîl Klinton nameyekiy pir metirsî bû bo ew wilataney emro le beramberiy Amrîkade lamîli deken be taybetîş Êran u Sûdan.

Cêgiriya Serokiy Amrîka Al Gor le dîmaneyekiy televizyonîda gutiy ême belgey pê selmênman heye ke Êraq le piştî koşkiy kuştiniy "George Bush" iy Serokiy Pêşûy Emrîkawe bûwe.

Rojnamey "Newyork Times" le jimarey rojîy 28 iy mangda amaje bo ewe dekat ke barêweberayetiya Amrîka pêy waye manewey Saddam Husên le deseltda debête mayey aramiy Êraqêkiy yekgirtû. Rojnameke pitir pêwe deçê u dellê: "Berpîrsiyaraniy Amrîka kesiyaniy be aşkira wa nalên belam hemûyan pêyan waye ke Êraqêkiy yekparça çêtire le Êraqêkiy sê parçey Kurd u Şîe u Sunne, eme debête mayey ewey Êran bikewête helpe u ko-

şîşiy dagîrkirdiniy hendê xakiy Êraq.

Dîsanewe rojnameke dellê kewa "xebatiy Amrîke ewey hendê hells u kewtiy Saddam bigorê nek lenawiy bibat." Bo em mebestey amaje bo guteyekiy Lês Aspen iy Serokiy Bergirî dekat ke gutûyeyiy "Rizgarbûn le Saddam nabête hoy çareseriy desbecêy gîrugirfteke"

Rojnamekaniy Êraq nûsînêkiyan bo ferîq Sabir Al-durî billaw kirdotewe ke tiyayda belên dedate Saddam bo tolle sendnewe. Le heman kat berpîrsêkiy serbaziy Amrîka le kendaw raygeyand ke hêzekaniyan amadeye bo rûberûbûniy her berperîçdaneweyekiy Êraq.

Êraq raygeyand ke taniya 8 kes le danîştwan kujrewin u jimareyekiy zoriy tîrîş birîndarin çîwar xanû wêran biwe u 33y tir ziyaniyan lê ketûwe u nîzîkey 50 otomobêl şikawin.

Saddam Husên le beramberiy em hêrişey Amrîka da gutiy: "Bîl Klinton bekrêgîrawiy zayonizme."

Fermana generalan hate cih

Navenda Nûçeyan- Rêveberiya Taybetî ya ku li 10 bajarên Kurdistanê tete ajotin, ji aliye koalisyona İnönü- Çiller ve careke din hate dirêjkirin. Bi vî awayî jî, biryara ku Heyeta Ewlekariya Dewletê (MGK) ji bo dirêjkirina Rêveberiya Taybetî girtibû, di Meclîsa Tirk re derbas bû û hate cih.

Di dengdana ji bo dirêjkirina Rêveberiya Taybetî de, ANAP û RP cih negirtin. Parlamenterên HEP'ê û hin ji, ji

yên SHP'ê dengên neyîniyê dan. Tevî hev 280 mebûs deng dan. Ji van dengên 207 erênî, 71 neyîniyê, 1 vala, 1 jî nelê derketin. Ev 207 dengên erênî yê DYP, SHP û MHP'ê bûn.

Partî û parlamenterên ku dengên neyîniyê avêtin, di beyanên xwe de dan xuyan ku, ev 15 sal in li bajarên Kurdistanê rêveberiyeyeke normal û demokratîk nehatiye ajotin û Kurd ji hemû mafên xwe yê

însanî mehrûm mane. Tevî ew yekê jî, pîrs çareser nebûye, berevajiyê vê her çûyê dijiwartir bûye. Ji ber vê yekê jî derketiye holê ku ev sîstem ne çare ye.

Nûnerên DYP û SHP'ê di axaftinên dengdanê de ji bo cara dawî jî parlamenteran dengê erênî xwestin. Lê partî û parlamenterên li derveyî hikûmetê, ji vî sozî bawer nekirin. Lewre eynî sozî, di dengdana beriya vê de jî dabûn.

Polîsên Alman bi ser saziyên Kurdistanê ve digirin

Almanya hevkarîya xwe ya bi TC'ê re her diçe xurttir dike û bi destê polîsên xwe azîneyên (metodên) polîsên Tirk dişopîne. Di rastiyê de polîsên Tirk li Almanyayê tene talîmkirin û hemû metodên li dijî mirovahiyê ji wan hîn dibin. Niha jî ew metodên ku hînî polîsên TC'ê kirine ew bi xwe li ser kes û saziyên Kurd pêk tînin.

Piştî livabziyên îşgalkirina konsolosiyên TC'ê Almanyayê li dijî Kurdan dest bi kirinên antî-demokratîk kir.

Polîsên Alman di yekê Tirmehê de li Kolnê bi ser Komîteya Kurdistanê û weşanxaneya Agirî Verlag ve girt. Polîs di van cerdên xwe de, herdu saziyan jî tevlihev kir û 3 kesan kir binçavîyê. Ji van 3 kesên girtî yê ku navê wan tesbît bûne Adem Uzun û Cengîz Demircî ne.

Polîsên Alman li Frankfurtê jî roja 29 ê Hezîranê bi ser komeleyeke Kurd ve girt û ji bo girtina komeleyê 3 meh mudet da.

Li ser navê hemû Komîteyên Kurdistanê û navendên enformasyonê, Kamîteya Kurdistanê ya Belçîqa beyanek da û dewleta Alman bi piştgiriya qetlîmanên TC'ê sîcdar kir.

Rêxistinên Kurd û Tirk li Ewrûpa dimeşin

Yekîtiya Hêzî ya Demokrat û Şoreşger ku ji rêxistinên Kurd û Tirk pêk tê, dê di 3'yê Tirmehê de li Bern, Parîs, Frankfurt, Koln û Hannoverê ji bo protestokirina "Şerê girêjî" ya li Kurdistanê dimeşe, cinayeta li paytexta Îsvîçre Bernê û êrîşên li dijî tevgera Kurd meşên mezin li dar dixê. Yekîtiya Hêzî ya Demokrat û Şoreşger (YHDS) ku ji partî û rêxistinên PKK, Tevgera TKP-ML, TDP KAWA TKP-Kivîlcim, MLSBP TKEP û Devrîmçî Partîzan pêk tê, "Rawestandina alîkariyên ku Ewrûpa dide Tirkiyê, serbesthiştina Kurdên ku di van xwepêşandanên dawî de hatibûne girtin û girtina Konsolosiya Tirkiyê ya Bernê" daxwaz dikin. YHDS, bi sernavê "Beşdarî meşê bibe" beyanek weşand: "TC a faşîst, qetlîamên ku li Kurdistanê dimeşîne, her diçe dijiwartir dike. Bi taybetî, di van heftiyên dawî de, gund û deveran ji erdê û ji hewa ve bombaran dike. Gund tene vala kirin û girtinên girseyî pêk tên. Hêzên leşkerî yê TC'ê li dijî qaydeyên şer, zêdeyî 50 gundî hilweşandiye û ji sedî zêdetir jî Kurd kuştîye.

Ev weşeta ku li ber çavên dinyayê tê meşandin, di qada navneteweyî de nayê dîtin. Ev jî hêz dide TC'ê ku qetlîamên xwe bidomîne. Hikûmeta nû ya Çiller ku wek hikûmeteke demokratîk derkete pêşberî gel jî, şopevanê vî siyaseta îmhakirin û pêkûtiyan e.

Ev meşên ku ji aliye Yekîtiya Hêzî ya Demokrat û Şoreşger ve tene organîzekirin, dê di 3'yê Tirmehê de saet li 11.00'an li paytexta Îsvîçre Bernê, paytexta Fransa Parîsê û bajarên Almanya Frankfurt, Koln û Hannoverê pêk werin.

Beşikçi dîsa mehkûm bû

Îsmail Beşikçi careke din ji ber nivîsên xwe di Dadgeha Ewlekariya Dewletê de hate darizandin û mehkûmkirin. Vê carê sebebê mehkûmbûna Îsmail Beşikçi pirtûka wî ya "CHP programı, 1913 Kürt Sorunu (Programa CHP'ê Pirsîrêka Kurdî 1913)" bû.

Dadgeha Ewlekariya Dewletê ji ber nivîsên di vî pirtûkê de, salek û heşt meh ceza da Beşikçi. Li aliye din weşanvane vî pirtûkê Ayşe Zarakolu jî, 5 meh heps û 41 milyon jî cezayê pere stand.

Îsmail Beşikçi, ji ber nivîsên xwe gelek caran di mehkemeyên TC'ê de hatiye darizandin, bi dehan sal heps, bi milyaran lîra jî cezayên pereyî standîye. Beşikçi bi van taybetiyên xwe berandamê pirtûka Guinnessa ya Rekoran e.

PÊNÛS



Amed Tigrîs

Fotograf û kultur

Î sal çend sal in ku em mamosteyên Kurd li Swêdê ji bo pirtûkên dersê xebat dikin. Heta niha me bi awayekî kolektîv pirtûkên dersê wekî: Em Bixwînin-1, Em Bixwînin-2, Em Binivîsin, Dîroka Kurd û Kurdistanê, Kurterastî nivîsîn. Ji sê salan bêhtir e ku ez, Nasir Rezazî û Fahad Gardawan li ser cografyaya Kurdistanê dixebitin. Çend meh berê me materyalên nivîsînê ber bi hevdu anî. Ez nexwazim li ser zehmetî û çetiniyên çavkaniyan rawestim. Lê, ez dixwazim li ser tiştekî gelek biçûk rawestim ku, me di vî warî de çiqas çetiniyê kişand. Ew jî fotograf bû. Piştî berbihevhatina nivîsaran me dest bi hilbijartina fotografan kir. Ji me re, ji her çar parçeyên Kurdistanê fotografên deşt, çiya, çem, gol, bajar, zozan, heywan û avahiyên maden, petrol û tiştên din lazim bûn. Sê meh in ku em sê kes li fotografên wiha digerin. Me pirtûkên çapkirî, albûmên kesan nehişt ku ji her çar parçeyan çend fotograf bibînin. Bi sedan Kurd çûne Bakur, Başûr, Rojhilat û Başûrê Rojava. Bi hezaran fotograf kişandine. Lê, hezar mixabin wekî nimûne be jî fotografêke bajar, gund an jî çem, deşt, zozan, keriyên pez, colên dewaran, cihên tarîxî û turîstîkên de- vera xwe nekîşandine. Ên ku kişandine jî xwe û malbata xwe dane pêş, an jî li hundir dê, bav û mirovên xwe kişandine.

Ev yek her çiqas jî me re tiştekî hêsan û basît be jî heta cihekî sewiya kultur û fêmkirina me dide xuyakirin. Nîşana bipaşvema- yîna me dide diyar- kirin. Heta mirov di- kare bibêje ku ev tiştên wiha nîştî- manperweriya me derdixê holê. Hel- bet nîştîmanperwerî ne bi fotografek an jî nivîsarekê ve girêdayî ye. Lê dîsa bibe nebe jî ev yek nîşana hezkirina we- lat derdixê holê. Heger mirov qasî dê, bav û mirovê xwe ji ba- jar, gund, çiya, zozan, gelî an jî cihên tarîxî hez bike, dê bibe nebe berê objektîva xwe bi wan ve jî bike. Jixwe me bi çî ma- la xwe xerab kiriye? Xwe biçûk ditiye. Ji axavtina Kurdî şerm kiriye an jî muhîm neditiye. Li tarîx û edebiyata xwe xwedî derneketine. Cil û bergê xwe li xwe nekirine. Axa welatê xwe neparastine. Ew kesên ku van tiştan biçûk bibînin helbet fotog- rafan jî biçûk û bêqîmet dibîne!

Li Ewrûpayê çiqas fotografêke Kurdan an jî Kurdistanê he- ne, navê Ewrûpiyan li bin wan e. Yanî ew fotograf ji aliyên rojnamevan an jî turîstên Ewrûpî ve hatine kişandin. Ew jî bo me şerm e û kêmasiyek e. Kurdên politik bi tenê hîni kişandina fotog- rafên kuştin, lêdan, îşkence, meş û mitîngan bûne. Ên din jî bi tenê fotografên dê, bav û malbatên xwe dişînin.

Di hêla naskirin û propâgandayê de fotografek dikare şû- na çend meqale an jî pirtûkan bigire. Her kes pirtûk û meqale naxwîne, lê li fotografê mêze dike. Fotografêke balkêş dikare bi salan di serê mirovê de bimîne. Fotografên ku min di dema zarokatiya xwe de di pirtûkên dibistanê de ditibûn piştî 30-35 salan hîn jî, ew tîn bîra min. Lê, nivîsar qet nayên bîra min.

Kurdên rojnamevan, fotografêkêş ên xwendekar an jî yên ku ji Ewrûpayê diçin welêt û li wir digerin, heger ji kerema xwe re ji gund, bajar an cihên lê digerin fotografên wan deran bikişînin û kom bikin, dê gelek baş bibe. Ew bidine dezgehên Kurdan, rojname û kovarên Kurdan. Bidine enstîtu, komel û dezgehên wan. Qet nebe ji xwe re arşiv çêbikin. Lê arşivên xwe jî bixîz xizmeta gelê xwe. Ev kar ne karekî biçûk e. Kare- kî gelek mezin û hêja ye. Kişandin û belavkirina fotografêke dever, bîra petrolê, siloya genim, keriyê pez, dar an kevirekî efsane dikare ji bo doza neteweyî û kulturî roleke mezin bilî- ze.

Li Ewrûpayê çiqas fo- tografeke Kurdan an jî Kurdistanê hene, navê Ewrûpiyan li bin wan e. Yanî ew fotograf ji a- liyên rojnamevan an jî turîstên Ewrûpî ve hati- ne kişandin. Ew jî bo me şerm e û kêmasiyek e. Kurdên politik bi tenê hîni kişandina fotog- rafên kuştin, lêdan, îşkence, meş û mitîngan bûne. Ên din jî bi tenê fotografên dê, bav û malbatên xwe dişînin.

Biwêj û giliyên argo

M. Zahîr Kayan

Di çand û wêjeyên her gelî de, li gor xwe hinek mî- nakên gelêrî hatine çêkirin, ev rewş rûçikê çanda gelan e. Di çand û wêjeya Tirkan de hinek biwêjên argoyî he- ne, lê ev argoyan ne wek ên Kurdî ne, lê wisa jî di navbera çandan de hevqetandinek û ji hev dûrketinek jî heye. Ev xwe di gelek bin- gehên çand û wêjeya gelan de dide xuyakirin. Em di- karin bibêjin ku, di nav Kur- dan de hinek biwêjên argo- yî bîr xebitandin ên di nav gelekî din de bi çavekî ne- rind û pêkenî bê bersivan- din. Her wiha xisletên gelan carinan jî hevdu nagirin û ev bûyer dibe sedema ji hev dûrketina çand û toreyê. Gi- liyên berzeq jî hinek tiştan tî. ev tişt jî ev in:

1. Ji rewş û jiyana erdnî- gariyê tê
2. Ji kesaneî û xisletên gel tê
3. Ji dîrok û çanda gel tê û hwd. Ku em mijara xwe li ser çand û toreya Kurd ava bikin wê demê mînakên gir- îng têkevin destê me. Lew îro mînakên bêjeyên argoyî yên çanda Kurdî ku tî go- tinê, li ba kesan pîrî sosret (çeyip) tî. Her wekî em dixwazin ku der heqê vê de dubendî bê çareserkirin. Di çanda Kurdan a gelêrî de mînakên pêkeniyan pîr in, lê ev berhem giş bi figurên argo ve hatine xemilandin. Hinek jî vê rewşê diqehirin û dibêjin ev berhemên han nakevin qada wêjeyê, lê bi rastî jî ev gotinên wan ne zanistî ne. Ew biwêjên argo- yî ku tî go- tin, di nav gelê Kurd de tu car nehatine qe- dexekirin û şermandin. Ev argo tim li ba hemû gelên Kurd rûspî, şêx, mele, se- yîd, axa û beg, jin û bûk, xort û keç, zar û hwd hatiye go- tin û xebitandin. Her gel gorî xuy û xisletên xwe ar- goyan diafirîne û derdixê holê. Mîzaha gelê Kurd der heqê vê rewşê pîrî dewle- mend e. Lê niha emê di vê hêlê de hinek mînakên ber- biçav bidin.

1. Der heqê hêrs û sîtem- kariyê de biwêj û giliyên ar- go:
 - Ca gûyên ku dixwe, heftê û heft bavên wî, vî gûyî naxwe.
 - Kurên bêbavan
 - Tolaz/ Tolazê kurê tola- zan
 - Çi ewte ewta te ye
 - Çêlek/ Gayê Xwedê/ Dewar û hwd.
2. Der heqê laqirdî û ti- nazan de biwêj û giliyên berzeq:
 - Min ji te re nedigot paşî- ya te dê biavêje
 - Boçik lê bûbû pîzpîzk
 - Tirrê/ tirrekan çawa pê ketibû
 - Qûna wî çarderî diavêt
 - Tirreko malî ava be
 - Ca çawa bêşewatê
 - Di nava hezar jinî de mîrek e
 - Xwelî li serê te be
 - Wek filên xesûya xwe gê
 - Ca çawa guhên xwe bel kiriye.
3. Der heqê bejn û bala mirovan, rû û rûçikên wan de biwêj û giliyên berzeq:
 - Ca lê binêre bejn xilçikek e
 - Çiqa tûtêdirêşkî ye
 - Bejn tûl e
 - Tulum
 - Qelaxa rêxê
 - Serconega
 - Qîç xar/ Dêl taji
 - Çavqelîşî
 - Pozxîtik/ Guhbel/ Dev- golik/ Pozqotan/ Çav kes- pik
 - Diranbevs
 - Cevpelqijî
 - Devrûtik
 - Sepeta rêxê
 - Poz cûlix
 - Serker
 - Çêleka ga û hwd.
4. Li ser kesaneîya miro- van biwêj û giliyên argo:
 - Têlmaşê çiqas serwext e
 - Çi gûxwireke
 - Çiqas çikkûs e
 - Çiqas kokmurûz e
 - Çi teba ke
 - Dikare diya xwe bifiroşe
 - Diya xwe dixemilîne difi- roşe bavê xwe
 - Çi xwînxwar e
 - Mirovekî çavlider e
5. Li ser mirî û zindiyan biwêj û giliyên argo:
 - Di ser kêlekên wî de bir- rîm mir çû, em jê xilas bûn

6. Li ser zarok û keçikên qîzîn, biwêj û giliyên argo:
 - Qîza dêlikan
 - Heçheçk
 - Hevdahîşiyayî
 - Kuro tûlo.
7. Li ser kal û pîran, biwêj û giliyên argo:
 - Ca li vî keftarên hanê?
 - Xurifiyê heram
 - Nefesa wî di qûna wî de, dertê
 - Gor bi gor nabe
 - Cih agirbûyî
 - Bêîmançûyî
 - Diranê qûnê derketine.
8. Li ser dem û dezgeh gili û biwêjên argo:
 - Gû di mal de heye
 - Mal bidehibe
 - Mal di serê we de xirab e
 - Mala kûçikan
 - Navmaleke wisa bû deve
 - tê de winda dibûn
 - Cihên têt/ Tehjiyan e
 - Cihên hirç û guran e
 - Mala dîn ecuniyan e
 - Mala wan de gû diavête qirrikê
9. Li ser mirovên bêşex- siyet û giliyên argo:
 - Kûçikekî çavlider e
 - Bêşermê kurrên bêşer- man
 - Wek kelbên har e
 - Wek kûçikan xwe diavêje kadî û xaniyan
 - Bêşermê heram
 - Berzeq.
10. Li ser xwarin û vex- warinê gili û biwêjên argo:
 - Mîda wî weke şikeftane
 - Çi vedikayî tu
 - Xwedê te têrbike
 - Birçiyê heram
 - Çavbirçî
 - Dixwe naxwe tîr bûn jê re tune
 - Bes e tî biteqî
 - Zaf nexwe dê giş bibe tîr û fis
 - Tu dibê jî qey ji xelayê derketiye
 - Çavên wî qet ji xwarinê tîr nabe
 - Hema wisa birçî ye.

Jinên Kurd û hezkirina dergûşan

M. Zahîr Kayan

Em li dîroka Kurdan a kevnare dinêrin. li çîrok û destanên wê mêze dikin. bi girîngiyeke mezin hezkirina jina Kurd a li ser dergûşê. xwe bi awayekî hezdar di de xuyakirin. Her wiha ev rewş di zargotinê gelêrî de didome û di çîrok û destanan de dibe motifekî girîng. Em dikarin bibêjin hezkirina dergûşê di çand û wêjeya Kurd a gelêrî de bi nirxê girîng û heja tê jiyîn. Lê em di gelek berhemên gel ên gelêrî de rastî vê bûyerê hatin û li serê xebitîn. Lêkolînên me der heqê vê babetê de pirr dewlemend derketin.

Hezkirina dergûşê xwe di gelek cihan de dide xuyakirin. Em dikarin vê rewşê bidin diyarkirin û der heqê vê mijarê de hinek mînakên berbiçav bidin. Jina Kurd qîmeteke mezin dide dergûşa xwe. Lew jina Kurd wiha difikire: Ku ez ji vê dergûşê hez nekim wê di nava gel de stûxwar be. Ez dixwazim ku mindal bi hezkirina dê û bavê mezin bibê û sibehê rabe. kêrî xwe û gelê xwe were. Ez jê hez dikim ku wek mezinan xwehisayî. dilovan û mîrxas be. Jê hez dikim. Lew bav û kalên me girîngiyeke mezin dane zarokan û ji bona wan gelek pergîn û mênhrîcan damezirandine. Jê hez dikim dê sibehê rabe bibe mîrê piştî me." Lê îro ku li Kurdistanê şerê çekdarî dest pê kiriye û li hember vê rewşê jiyaneke nû hatiye çêbûn. Jina Kurd giş bi wateyêke mezin li ser dayîkbûyîna dergûşan disekin. Dibêjin ku ev zarok sibehê me-



Di nav Kurdan de jin bi hejmara zarokên xwe serbîlind e. Jin li ser dergûşa xwe gelek bi hesas e. Bi êş û kulên salan pêçeka xwe xwedî dike, jê hez dike.

zin bibe dê ji bo welat şer bike. Dema em li gundan geriyên me der heqê hezkirina zarokan de jiyaneke bi bîngêh û bi rûmet dit û em dilxweş bûn. Her wiha ev bûyer li gelek gundên Kurdistanê xwe bi hinek motifên kevnare yên dewlemend ve dide xuyakirin. Me bala xwe dayê ku, jina Kurd bi hinek biwêj û giliyên heja gazî zarokan dike û bi hewes û evîndariyê giran ji zarok hez dike. Jina Kurd bi van biwêj û giliyan zarokan xwe dinixîne.

1. Gula min
2. Ruh û canê min

3. Berxa min
4. Sitar û mikana min
5. Mêrê ber mala min
6. Kana aqil î
7. Congirên mîran
8. Xortên eşîrê
9. Sîr û şekirê diya xwe
10. Cavê min, dilê min, cîgera min û hwd...

Jina Kurd hinek kincên gelêrî jî li zorak dike. van kincan bi xwe dibire û didurû. Hinek morî û kespikan bi zarok vedike: ji bo nezera çavan ku zarok neke bin bandora xwe. Di nav gel de der heqê jiyana zarok de hinek bawariyên kevnare yên dîrokî he-

nin. ji van baweriyên:

1. Ku zarok li ber destê dê mezin bibe wek jina hîn dibe û ev tiştêkî ne rind e.
2. Zarok di kîjan civakê de mezin bibe dê xuy û xisletên wê civakê hilde.
3. Zarok divê di biçûkatîya xwe de hîni hinek tiştên bi rûmet bibê.
4. Gere zarok li neynikê nenêre. dema lê binêre dê bitirse û ev rewş ji zarok re ne rind e.
5. Pêwîst e ku, zarok li heyvê nenêre. Dema lê binêre dê bi heyvê bikeve.

6. Tim û car zarokên kurîn xuy û xisletên wan diçe ser xalên wan.

7. Zarokên kurîn bavê xwe pêşeng dibîne. zarokên qîzî di-ya xwe...

8. Gere zarok ji xewê bi zor neyên rakirin û hwd.

Jina Kurd bilî van xuy û xisletan hinek berhemên girîng û dewlemend afirandine. ev berhem gelek caran bi zimanekî xweş ve tê gotin. Jina Kurd hezkirina xwe bi hinek kilaman ve aniye ziman û ev rewş di wêjeya Kurdî ya devkî de cihêkî bi rûmet digire. Emê niha ji van kilamên ku jina Kurd ji bo zarokan aferandine çend mînak bidin.

1. Remezan çûbû
Nanê pala dan
Kelem ketibûn
Tiliyan da
Bavê gotibû:
"Ax li min"
Diya wî gotibû
"Xwelî li min."

2. Kurro, kurro
Kurriko
Gizme soro
Sîrriko
Sixul ji
Diya xwe re nake
Serê diya xwe
Bi qurbana xwe dike

3. Xwedê. Xwedê
Xwedî bike
Hircê berdan
Kudikê
Seba xatirê
Pittikê.

4. Pitik
Wê de tê dikene
Ser milan tijî
Tentene
Bav axa
Dê cingene.

Dîlokên bûkan

Jîr Dilovan

Di çanda me de xwestin, şîranî û guhertina bûkan. cihêkî pirr bi rûmet û girîng digire. Ez dixwazim hinekî li ser guhertina bûkan rawestim û li ser wê dîlokekê pêşkêş bikim.

Piştî ku aliyê (rexê) zavê û bûkê li hev hatin û qelen vebirîn. êdî şîraniyê pêk tînin. Piştî şîraniyê jî dibe kar û barê guhertinê. Berî anîna bûkê bi rojekê. ji aliyê zavê çend pîrek û keçik bi navê "berbûrî" diçin û bûkê kar dikin. Roja din bi beşdariyêke mezin "xêlivan" berê xwe didine gundê bûkê û li mala wan dibine mêvan. Keçikên delal û bedew mil didine hev û dîlokên bûkaniyê li hev werdigerînin.

Di nav dîlokan de dîloka "Xerîbiyê" gelekî balkêş û girîng e. Kêliya ku bûk wê ji mala bavê qut bibe. li pêşberî

bûkê vê dîlokê dibêjin. Ew bûka dilşad û bextewar. bi carekê melûl dibe û dide girî. Ron-dikên (hêstir) wê şeş şeş têne xwarê.

XERÎBIYÊ

1. Xerîb xerîbiyê
Çola Bişêriyê
Xwelî li halê te zeriye
2. Xerîbka biyanî
Agir kete xanî
Kes halê keskî nizanî
3. Xerîb mere mere
Çêke tayîj bere
Tastê bixwe dîsa here
4. Xerîb nanê pehtî
Stêra zer hilatî
Xerîb rabû ji vî welatî
5. Xerîb çûbû dara
Werîs li ber bû mara
Xerîbê rabe êvar e
6. Xerîbka çinêrî
Tiriyê dehla jêrî
Nivî reş nivî sincêrî

7. Lo Keko Emîno
Xwîska xwe bibîno
Cûyîn heye veger nîno
8. Lo Keko Izero
Xizêma min zêro
Nav neyara min nede mêro
9. Birakê jinbavê
Min xêra te navê
Mera te here li ber avê
10. Birakê ji dêyo
Min xêra te divêyo
Tu bibe Mîrê Misrêyo
11. Xwezî Xerîb neba
Gula nav bexçe ba
Li cih û warê bavê xwe ba
12. Porê min spî ye
Fetla sih û sî ye
Sûstna dayîkê cindî ye
13. Porê minê reş e
Fetla sih û şeş e
Sûstna dayîkê çi xweş e
14. Porê minê sor e
Fetla hawîrdor e
Sûstna jinbavê çi zor e
15. Xerîbka Osmanan
Sabûna kizwanan



Bûka xemgîn û şermîn/ Dimeşe bi kincên rengîn/ Jiyanek hişt li dû xwe/ Da ku xweştir bibe jin.

- Serdestê gundî cîranan
16. Xerîbka Xwedê ye
Darka devê rê ye
Hesreta mala bavê ye
17. Xerîbkê çi goto
Cotkar cûne coto
Xerîbê kember firoto
18. Heyla li min xerîbê
Bêqedr û nasibê
Xwedê neke kes bêxwedî bê
19. Hevalka kaniyê

- Cavê dayîkê teqiyê
Cawa dayî xerîbiyê
20. Hevalka giwîniya
Cavê dayîkê teqiya
Cima ne dayî gundiya
21. Xerîbkê delalê
Xeftan li bejn û balê
Xêlivan hatin bermalê
22. Xerîbkê bi rê ket
Serî li sêrderê ket
Agir bi dilê birê ket.

Enfal: Rojeke herî tal a Sehrawî

Niwa Hebîb

Di demajoya şerê navbera I-raq û Îranê. Sedam di havîna 1988'an de, leşkerên xwe kom kirin û bi êrişeke berfireh girte ser Kurdistanê. Ev êriş bi sê caran ve pêk hat. bi navê Enfala Yekemîn, Enfala Duyemîn, Enfala Sêyemîn. Peyva Enfal bi xwe di pirtûka ola îslamê ya pîroz Quranê de heye. Sedamê xwînwar ev peyv kire dirûşma (slogana) qirkirina Kurdan.

Lê çi heye ku, gelê Kurd li hemberî vê êrişê bêçek û bêmade bû. Pêşmerge ji lewaz û bêbawerî bû. Dijmin ji dirende, hov û bêrehm. Ev êriş bi dîlgirtina 200 hezar Kurd, jin, pîr, kal, mêr, zar û zêç ve dawî lê hat. Bi erebeyên bar ve ew birin başûrê Iraqê û li Seherayêya navbera Iraq û Siûdî bi zindî xistin bin axê.

Li başûrê Kurdistanê, gelê Kurd li hember vê karesatê (bobelatê) felaketê hê ji gēj maye. Hin mal bi temamî ketine ber enfalê hin mal jî, nîve nîv. Hin kes jî xwe ji erebeyan avêtine û ji enfalê xwe rizgar kirine. Ew kesên ku xwe ji enfalê rizgar kirine ev sosreta hanê ji xelkê re gotine, ji rojnamevanên Kurdên Başûr û yên Ewrûpî re serpêhatiyên xwe vegotine.

Li başûrê Kurdistanê piştî raperîna (serhildana) 1991'an ev serpêhatiyên enfalê hêja hatine weşandin û belavkirin.

Ev serpêhatiya li ser Sehrawî nivîskar bi xwe ji mirovên rastbêj bihistiye û ji bo xwendevanên Welat re dinivîse.

Du kesan ev serpêhatî ji min re gotine. Yek ji wan birayê min bû. Ew beriya Şerê Kendavê, li başûrê rojavayê Seherayêya Iraqê leşker bû. Gote min: "Ez şofêrê fermanarê yekîneyeke (birlik) leşkerî bûm. Ez her roj di rîya Seherayê de dihatim û diçûm. Carina ez li malên Ereben koçer (bedewî) dibûm mêvan, carna jî, ji bo avxwarin an bêhnvedanê li cem wan radiwestiyam. Di van çûnehatînan de ez û kalemêrekî ji Ereben koçer, bûbûn heval. Her cara ku rîya min ber bi konê wî ve diçû, gazî min dikir ku bibim mêvanê wî. Dizanibû ez Kurd im û gelek rûmet dida min.

Di van serdanên xwe de, min carek bi dudilî û tirs jê pîrsek kir: "Mamê Pîr: li bakur di nav gelê me de gotegotek heye ku, dibêjin di dema enfalê de jin, zarok, mêr, kal û pîrên me yên ku hatine dîlgirtin ew anîne Seheraya we. Te der barê vê yekê tiştek de bihistiye? "Ka-



Kuştinên bi koman yên zaroyên Kurd li bin dirûşmê peyvê Enfal (di zimanê Erebi de bi maneya pîroz tê bikaranîn) Sedam li gor mejiyê xwe bi kuştina girseyên gel tiştêkî 'pîroz' pêk tîne.

lemêrê Erebi koçer çavê xwe girtin, axîr rahîst, serê xwe hejand û got: "Kurê min: ger tu li birayên xwe yên Kurd dipirsî, here li nava van giran bigere, mimkûn e ku tu pergî (rastî) kinc û kilajên (pêlav) Kurdî, werî."

Birayê min ji min re got: "Tevziyek seranser bi min girt. Koçerê Erebi ji vê pê ve jî, ji min re tiştêk negot. Min jî, ji kalemêrê Erebi re negot ku ev Kurdên birayên min bi gullebaranê hatine kuştin an jî bi zindî hatine binaxkirin. Lewre min nedixwest dîmeneke wisa were ber çavê min.

Birayê min gote min: "Danîştina min a di gel kalemêrê Erebi qediya. Bi xemgînî malavahiyeke dayê, ji bin kon derketim

û çûm cem hevalên xwe. Dilê min rehet nebû, heta ku min ev serpêhatî ji we re venegot."

Ev kesê duyemîn ê ku serpêhatiya enfalê ji min re vegot, hevalekî min ê nêzik e, ev 3-4 meh in ku ji Kurdistanê derketiye. Niha li ku dijî ez nizanîm ev kes jî wiha gote min: "Wê gavê hinek lêzîmên (eqrebeyê) min li Seheraya navbera Iraq û Siûdî leşker bûn. Rojek rîya wan bi konekî Ereban dikeve. Dibine mêvanê wan. Piştî nanxwarinêyêk ji wan ji xwe-diyê malê, li ser Kurdên enfal bûyî dipirse. Kalemêrê Erebi bersiva wî dide. Dibêje: "Kurê min, ew Kurdên we rojek li nîvro ji aliyê leşkerên Sedam ve bi zindî hatin binaxkirin. Ev roja

Sehra dîmeneke bi gelek tirs û saw bû. Tenê Kurd û "heres cumhurî" (Leşkerên taybetî yên Sedam) li derve hebûn. Tu benderuhek newêribû ku ji kunên xwe serê xwe derxistin der. Kes nizanibû ku çi diqewime. Piştî ku peyayên Sedam karên xwe qedandin lê xistin û çûn.

Pişt re bû şev, lê şeveke gelek bi xof û saw: Ku tarî bi ser rûyê erdê ve girt car carina girîna zarokêkî dihate guhê min. Min di dilê xwe de gote ku dibe ev zarok ji mala xwe veqetiya-be, winda bûbe. Xew nediket çavên min. Min xwe ranegirt, ez derketim derveyî kon û ber bi dengê girîne ve çûm. Gihîştîm cihê ku zarok lê bû. Min dît ku zarok ji çalê derketiye û nemiriye. Min ew hilda hembêza

xwe û anî mal. Zarok sê-çar salî bû, min ew xwedî kir. Niha ew kesê ku çay û xwarin ji bo we anî, ew zarok bi xwe ye. Min navê Sehrawî lê danî. Ji ber ku min ew li seherayê dîtibû."

Vêca leşker wiha gote min: "Ez û hevalên xwe derketin derveyî kon. Min li zarok nêrî. Min xwest ku şeklê wî hilgirim çavên xwe. Min bi têra xwe li Sehrawî nihêrt. Lê pîr xemgîn im, min nikaribû ew bianiya ji bo Kurdistanê. Xemgîniya min a din ew e ku Sehrawî bi serpêhatiya xwe nizanibû û nizanibû ku, Kurd e jî. Ew gav em leşkerên firar bûn, mişext bûn."

Sehrawî!

Ez nizanîm tu bi kîjan enfalî hatî dîlgirtin. Bi Enfala Yekemîn, Duyemîn an jî bi ya Sêyemîn. Her wisa nizanîm di dema dîlgirtinê de tu çend salî bûyî. Dudo, sê an çar? A din ez nizanîm hejmara Kurdên enfalkirî çend bû. Belê ez nizanîm ji ku, li kîjan deverî hatî dîlgirtin. Qeredax, Germiyan, Badînan an Deştîkoy?

Herê ez nizanîm ger tu nehatibûna girtin, di pêşerojê (dahatû) de te dê bi kîjan awayî stran bigotina. Horeya Cefan¹, Siyaçeman a Hewreman², Lawikê Kurmancî³ an jî Qetarê Germiyan⁴?

Lê bi tenê dizanim ku tu nepeniya mezin a vê dema me yî û bobelata mezin a gelê Kurd î.

Ew hevalê ku serpêhatiya Sehrawî ji min re got, niha li derveyî Kurdistanê dijî, bi xwe nivîskar û helbestvan e. Min gote wî ku li ser serpêhatiya Sehrawî helbestekê binivîse. Gote min: "Ez dê binivîsim, lê gava ku şewata agir bikeve hinavê min."

Min gotê: "Navê pirtûka helbestên xwe bike Sehrawî." Lê bersiva vê daxwaziya min neda. Lê ez bawer im ku, niha li welatê biyaniyê pêta agirî bi dilê wî girîtiye û tiştine xweş dinivîse.

1. Hore: Navê stranên êşî Caf, li başûrê Kurdistanê.

2. Siyaçemane: Tê maneya keçên çavres. Ev strana Hewreman gelek bi nav û deng e.

3. Lawikê Kurmancî: Stranê folklorî ya zaravayê Kurmancîye.

4. Qetar: Strana Kurdî ya devera Germiyan, li navbera Kerkûk û Xeneqîn, başûrê Kurdistanê.

Têbînî: Ev derên jorê hemû ketibûn nav sînorê enfalê û gundiyan wan hemû hatibûn dîlgirtin.

Di warê muzîkê de komponîstekî mezin: Grîeg

Gavan Koçer


Li bajarê Norwecê li Bergenê, her sal di meha Hezîranê de hefteyek festîwala muzîkê tê lidarxistin. Bergen, bajarê çandê. Bajarê çanda klasîkî. Wek tê gotin paytexta Oslo, bajarê çandê jî Bergen e. Bi rastî jî Bergen bi rindiya xwezaya xwe, bi çalakiyên xwe yê çandî ve balan dikişîne ser xwe. Şexsên wek Ole Bull, Edvard Grieg di vî warî de risteke mezin dilîzin. Orkestraya Senfonî Bergenê bi nav û deng e.

Lê festîwala 15'ê Hezîranê ya îsal xwedî rengeke din bû. 15'ê Hezîranê roja pîrozkirina (jubileyê) 150 sala komponîstê mezin Grieg, bû. **Edvard Hagerup Grieg** jî vê 150 sal berê di 15'ê Hezîranê ya 1843'yan de li bajarê Bergen ji dayika xwe bûye. Di festîwalê de Norweciyan berhema xwe ya heja bi çalakiyên xurt pîroz dikirin. Şeva festîwalê her çend giranî dida muzîka Grîeg jî bi her awayî atmosfereke navneteweyî li cihê festîwalê bû. Muzîka komponîstên mezin û navdar wek Tchaikovskî, Beethoven, Wagner bi orkestraya senfonîya Bergenê ve di bin serokatiya dirîgentê Rûsî de di hola festîwalê de temaşevan bi deqîqan radikir ser piyan. Dengê fiolinê, piyanoyê bi enstrûmantên orkestrayî ve tevlihev dibû û bihîstineke xweş di guh û mejîyan de, diafirand. Bi rastî jî dema piyanîsta Norwecî ya navdar Leif Ove Andsnes parçeyên Grîeg lê dixist, ji holê bi deqîqeyan çepik derdiket.

Grîeg hê di zarokatiya xwe de bi muzîkê ve mijûl dibe. Ew perwerdeya muzîka xwe ya pêşemîn li ba diya xwe digire. Di 15 saliya xwe de ew bi şîretên fiolinîstê mezin Ole Bull, koçiya konservatoriye ku li bajarê Leibzigê (Elmánya) ye, dibe. Û li wir çar sal muzîkê dixwîne. Dixwîne, lê dengê ji Grîeg demakeve. Qabiliyet û taybetiyên wî hê wek gewhereke ku neyê şuxilandin, veşartî ne. Heta ku ew di sala 1863'yan de li Danîmarkayê rastî Rikard Nordraaktê (Nordraak komponîstekî Norwecî bû ku, marşa neteweyî jî hêla wî ve hatiye nivîsandin).

Sala 1863'yan, di jiyana Grîeg de destpêkirina pêvajoyeke nû û zînde ye. Grîeg xwe di nav muzîkala neteweyî de dibîne. Li Ewrûpayê dem dema muzîka neteweyî ye. Muzîka neteweyî di warê muzîkê de stêrkên mezin diafirîne. Li Îtalyayê komponîstê operayê Verdi, ku dibe sembola têkoşîna neteweyî û yekîtiyê, li Rûsyayê Pjotr Tchaikovskî, li Polonyayê Chopîn, li Danîmarkayê Carl Nielsen û hwd. Ev dem dikare wek dema serhildana muzîkê ku welatên der û dorên herêmên Ewrûpayê li dijî heza herêmi pêk anîbû jî, bê nixandin.

Grîeg di hunera xwe de giranî dide xweza û folklorê gelê xwe. Ji bo vê yekê jî, ew melodyên gelê Norwecê berhev dike, li ser wan dixebite, awayek dide wan û di kompozîsyonên xwe de bi kar tîne.



Grîeg di hunera xwe de giranî dide xweza û folklorê gelê xwe. Ji bo vê yekê jî, ew melodyên gelê Norwecê berhev dike, li ser wan dixebite, awayek dide wan û di kompozîsyonên xwe de bi kar tîne. Pirranî jî çavkaniyên wî melodyên jinên Norwecî yê pîr in. Ew li wir taybetî û kokên gelê Norwecî dibîne. Melodiyên gelêrî heza zimanekî harmonî, muzîkaleke zikmakî, azweriyeye (ihtiras) erotîkî didê wî. Ew jî huner û fantasiya xwe dide şuxilandin û li ser dimensiyonên cuda muzîkeke neteweyî diafirîne. Ev hîsên neteweyî ne ku li ba Norweciyan bîr û baweriyeye rêk û pêk peyde kiriyê. Jixwe ew rengê gelêrî ya ku wî kompozîsyonên xwe li ser bilind kirine, ew kiriye hunermendekî mezin. Îro di kompozîsyonên wî de her Norwecî dikare taybetiyên xwe yê gelêrî bibîne û bi kesaniya xwe serbilind bibe. Di vî warî de li festîwalê muzîkvanekî Norwecî hîsên xwe wîha dianî ziman: "Em bi Grîeg serbilind in. Wî bi hunera xwe di qada navneteweyî de serê me bilind kir. Lê em ne dixwazin wî ji mezinahiya wî zêdetir an jî kêmtir bikin. Grîeg bi berhemên xwe Grîeg e."

Bi rastî jî Grîeg di giyana muzîka gelê xwe de gelek berhemên heja afirandine û di van berhemên de kesaniya xwe daye şuxilandin. Tiştê ku berhemên Grîeg dike xwedî rûmetê, afirandina balansê ye (deng e). Balansa zanîn û boriya wî ye. Zanîna ku wî li ser muzîkê ku wî li Leibzigê hîn kiribû. Zanîna Leibzigê û tona melodya muzîka gel, govenda Norwecê bi hev re hunereke xweş diafirînin. Têkiliyên wî yê bi xwezaya Norwecê (bayê çiyayan, newalan) re di giyana wî de hîsên neteweyî xurttir dikin. Mirov dikare bibêje qabiliyeta Grîeg a mezin ew e ku wî muzîka xwe li ser taybetiyên gelê Norwecê çeki-

riye û giyaneke navneteweyî jî pêk aniye. Jixwe muzîkeke xweş û bi kalîte yê lokalî, bi hêsanî dibe gerdûnî jî.

Grîeg, di muzîka xwe de xwedî prensîb e. Muzîkê jî bo berjewendiyên şexsî û hêzên dewlemend çênake. Li dijî dagirkeriyê muzîkê wek navgîna têkoşîne dibîne. Bi gotineke din li gor wî muzîk qada şer e. Di dema xwe de dibe parêzkarê welatekî serbixwe. Welatekî ku mirov bi xwe biryaran digire, ne hêzên derveyî. Di dema wî de Norwec hê bi Swêdê re ye. Ji bo vê yekê ew pirranî bi pîrgirêkê neteweyî ve mijûl e. Bi kurtî ew bi politikayê jî mijûl e û dubendiyên demê jî xwe re dike mijar.


Grîeg gelek kompozîsyon nivîsandin. Lê, yê herî mezin kompozîsyona konserta piyanoyê a moll (mînor) e. Ji vê muzîka "Peer Gynt" ku drameyêke Ibsen e, "ji demê Holberg" (Ludvig Holberg: dramatikarê şaxnoyê; 1684-1754) berhemên Grîeg yê heja ne.

Dibe ku Grîeg di warê hunerê de wek Johan Sebastiyân Bach, Wolfgang Amadeus Mozart navdar nebe. Lê awayê ku wî di kompozîsyonên xwe de muzîka gel bi kar aniye, qabiliyet û hunera wî berbiçav dike û wî diavêje nav hunermendên dinyayê yê herî mezin.

Grîeg di jiyana xwe de dikaribû hê berhemên zêdetir jî biafirîne. Lê, nexweşiya zikê wî ku hê ew di xortaniya xwe de wek dilek girtibû, nedihîşt Grîeg gelek bilive. Ji bo vê yekê jiyana wî di nav du hêzên dijraber re derbas bû. Hêza hunerê ku dixwest nirxan biafirîne û ya nexweşiyê. Nexweşiya laşî ku ew derbexer dikir, nedihîşt ew hunera xwe bi kar bîne. Lê giyana vî komponîst û dirîgentê mezin ta ku di sala 1907'an de li Trollhaugenê çû ser dilovaniya xwe jî têdikoşiya.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Keşîş û Mele

Li gundekî, mirovekî rezvan hebûye. Rojekê bala xwe didê ku, keşîş, mele û cînarêkî wî bi hev re ketine nava rezê wî, tiriye wî diçin û rez pêpes dikin. Rezvan gelek diqehire, lê ji wan jî ditirse û newêre bela xwe li wan bide. Zane ku, ger ew her sê bibine yek dê bi wan nikaribe.

Rezvan gelek şareza bûye. Difikire ku wan ji hev veqetîne, yeko-yeko bihêle û berê xwe bide wan. Pêşî gazî keşîş dike. Dibêje: "Keşîş e-fendî, tu qet ji rûyê xwe û ji xaça xwe fedî nakî? Tu ketiyî nav rezê min û weke heywanan dixwî. Mele seydayê me ye, cînarê min jî, jixwe cînar e, malê min ê wî ye jî. Lê tu hem ne misilman î,

Gur, hirç û rûvî jî bi hev re ketine nava rezê me. Divê em jî weke rezvanê şareza, wan ji hev û din bixînin û her carê bi hincetekê berê xwe bidîne yekî, ta ku keysa xwe bibînin berê xwe bidin ên din jî. Lê fend û fûndên rûvî pîr in, zû bi zû nakeve dafikan. Divê mirov pîr şareza be.

hem jî ne cînar î. Çi heqê te heye ku tu ketî nava rezê min?". Piştî van gotinên xwe hema êrîşî keşîş dike, dikeve ser dilê wî û rind lê dixê, dû re jî ji nava rezê xwe diavêje.

Piştî ku keşîş safî dike, berê xwe dide mele. Dibêje: "Seyda, tu qet ji rûçikê xwe û şaşika li serê xwe şerm nakî? Qaşo tu misilman î. Tu çawa bûyî hevalê keşîş û ketî nava rezê min. Tu qet ji Xwedê jî natirsî, fedî nakî? Hele cînar, cînarê min e. Heq û hiqûqên me li cem hev hene, malê min li wî helal e. Lê tu bi çî hincetî ketî nava rezê min û weke dewaran dixwî?" Û êrîşê mele jî dike. Şaşika wî dixê qirika wî û bi erdê re dikişîne.

Piştî mele jî safî dike, hinek bêhna xwe vedide. Dû re radibe ser xwe û berê xwe dide cînarê xwe. Dibêje: "Lo cînar, kurê seyê belek. De em bibêjin keşîş ne misilman e, mele jî bêhman e, herdu jî hînî xwarina malê xelkê bûne û cînarên me jî nîn in. Lê qaşo tu cînarê me bûy. Tu çima bi wan herdu teresan re ketî nava rezê min, tu qet şerm û fedî jî nakî? Qet wicdan û merhemeta te jî nîn bû ku, we rezê min nûbergirtî xerab kir. Kurê kerê reş". Bi van gotinan re, berê xwe dide cînar jî û dilê xwe tê de rehet dike, dû re jî wî ji nava rezê diavêje.

Rezvanê şareza, bi vî awayî hersiyar jî perîşan dike û îtifaqa wan dipelişîne.

Gur, hirç û rûvî jî bi hev re ketine nava rezê me. Divê em jî weke rezvanê şareza, wan ji hev û din bixînin û her carê bi hincetekê berê xwe bidîne yekî, ta ku keysa xwe bibînin berê xwe bidin ên din jî. Lê fend û fûndên rûvî pîr in, zû bi zû nakeve dafikan. Divê mirov pîr şareza be.

Li ser bîranîna şehîd Nazmî Uçar Nameyeke derengmayî


Jîr Dilovan

Heval Ronî! Tu wek qevdek gulên ji xwînê li ber çavên min î. Dema li Stîlîlê tu di kar û bara serê çiyayên Kurdistanê de, ez te bi bîra xwe tînim. Li ser axa merdemêran, li diyarê Omeriyan, ji ba çinara Apê Mûsa tu wek şitleke rihanê şînhafî, mezin bûyî û te di dilê me de şaxên xwe vedan.

Heval Ronî! Buhayê serxwebûn û azadiyê pirr giran e. Li ser rûyê gerdûnê tu gelan, mîna gelê Kurd xwîn nerijandîye. Bi dehan, bi sedan, bi hezaran û bi sedhezaran egîd û lehengên mîna te, gul û kullîkên çiyayê welatê min, bi xwîna xwe ya pak û paqij av dane. Her bihostek û her gavek ji axa welatê min bi xwîna we şehîdan hatiye şuştin.

Heval Ronî! Bi şehîdbûna te pirr eşiyam. Lê min, ji bo şanebûna xayîn û dijminan hêstir nebarandin. Min hêstirên xwe bi dizî, bi ser şewata dilê xwe de herikandin. Piştî şehîdan şîr û girî ne karê me ye. Vê tenê zani-be ku, em Kurd hemû li ser şop û rêça we ne. Ew şop û rêça we ku we mîna heyv û rojê bi şewq û şemal û bi lêlan kirî. Tîrêjên wê şewq û rimiya we ya geş, çav li xayinan, xwefiroşan û nokeran kor dike.

Delal Ronî! Stîlîlê bi te pirr



Em agir in/ Em agir in/ Em kîn in/ Em karker in, em gundî ne/ Em giş yek in/ Em, bi kesên ku dibêjin tohildan re, sed hezar in / Em dengê gelê Kurd ê ku serî hildide ne. Dr. Ronî

geş bû. Serbilind û birûmet bû. Mixabin ez dîrî te bûm. Min diviyabû ku ez beşdarî dawet û dîlana te bûbûma. Min jî, ji dil û can "Ey Reqîb û Ey Şoreşgerê Kurdistan" bixwenda. Lê çiqas tu ji min

dûr bî jî, mîna navê xwe tu ronîya çavên min î. Şewqa te wê tim riya me ronî bike. Em li ser şop û rêça te ne. Silav ji şehîdên şoreşê re, silav ji şehîdên Kurdistanê re...

Va ye dipeqe volqan

Ji vî dilî dertînim
Sed keserên kûr û dûr
Sed axîn û sed nalîn
Dema dibînim birîn
Li ber çav e
Vedigere
Li her kermêj...
Li her bîn.

Lê çî bibêjim...
Ji bo bermayên dîrok
Ên gemar û pirr pîsok
Ên xwe dikin planzan
Lê jê dîr in
Wek dûrbûna erd ji ezman
Êlperest û olperesten
Fewdelist in ne durist in.
Çi dibêjin?..
Çi dixwazin?..
Ji bo çî?.. Ji bo kê?..
Otonomî ji bo gel, kêman e
Ho birano...
Ho birano, bes e ji bo me nezanî
Va bû sed sal, ma wan ji bo me
Çi anî?..
Gelê cîhan bi duristî girtin rê
Xwedî maf bûn li cîhanê
Bi golê xwînê bidê.

Pirsa min e ey taziyan bi rengê min
Wan kiriye ji bo me çî?..
Gelo, dane dil û can
Yan malên wan bûn talan
Gelo mane ji wan zarok
Birçî bûne şev û rojek?
Gelo kî ne?..
Gelo kî ne li Diyarbekirê,
Li Mêrdîn,
Li qampên dijmin?..
Li dora wan sûrên bilind
Wekî sûra Çîn

Gelo kî ne li bin serma
Li ser seqem
Germ û tîn.
Ho birano...
Gelê me ye dide can
Dibe tazî, laş tê şuştin
Ji xwêdan.

Gelo kanîn...
Kanîn rêber û serok
Ên xwedî top
Xwedî firok

Ên digotin em xuya ne li cîhanê
Wekî roj,
Li ser dijmin em in ar
Dijmin dike sed nalîn û sed
hewar?

Rojekê ji riwên adar
Hilweşandin hemû war
Şewitandin hişk û ter
Ên felîtn kirin der

Gelo kanîn
Kanîn rêber û serok
Ên xwedî top
Xwedî firok
Ên digotin em xuya ne li cîhanê
Wekî rok
Ger dixwazin em bizanin cihê wan
Divê bibe pirsra mirov li şîretan
Mîrdîyan

Dil negire ey heval
Welatparêz û guhdar
Ji dil şewitî, ez dikime kale kal
Kulê salan ez dixwazim bînim xwar

Riya wiha nezanî
Bi destê talanî
Gel avêtin li bakur û rojhilat
Hê dibêjin va ye roj li Kurd hilat
Gel firotin li barîs
Bi doza Îdrîsê Bedlîs
Em avêtin li nav piyan
Sewî hiştin li cîhan

Çavan vekin tev binêrin li Botan
Va ye dipeqe volqan
Pêt û birûskan vedide tev cîhan
Çepika dide ji bo zarokên Filîstîn.
Dibêje lêxin,
Em bi we re bişon ew laşê bi xwîn

Va PKK li benda we ye
Kurdistan ji kîna salan diderîn
Li Nisêbinê, li Mêrdînê, li Botan
Li Qilaban, li Silopî serhildan
Li dijminan bo guran
Li sîxuran bo ferman
Tev direvin ban dikine
Sed hewar... Li me borin em Poşman in
Bes e êdî ev carê
Em jî yar.

Zana

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Parlamentera Kurd. Berê di rojnameya Yenî Ülke de rojnamevanî dikir. Di hilbijartina giştî ya dawî de, li Diyarbekir ji HEP'ê wek parlamenter hate hilbijartin. Di wêne de tê dîtîn/ Cînavka kesanî ya yekemîn a pirrhejmar 2-Biyani, yên ne ji dîne îslamê/ Sikûnet 3-Di hinek devokên Kurmancî de 'ger'/ Piştî çinîna zad bermayiyên ku di erdê de dimînin, qarot/ Mehzûn 4-Eşîret, êl/ Yek ji gelên Rojhilata Navîn/ Serokê serhildana li hember Dehaq 5-Yarmetî/ Sembola Îrîdîûmê 6-Rengê sorîya agir/ Sembola Sodyûmê 7-Terîqetêke navneteweyî. Di Locayan de dicivin û li dewletên ku lê hene bi hikûmetan re tîkiliyên xurt datînin 8-Bi kêrî jêkirin û birrîne tê/ Ne dîr 9-Bawerî 10-Navê îdeolojiya nijadperest a Îsrailê

Serejêr: 1-Qehreman/ Berê wek cizdan dihate bikaranîn 2-Dawîya jîyanê, dema mirinê/ Pozîtîf 3-Li başûrê Kurdistanê rêxistînek, serokê wê Celal Telabanî ye/ Vexwarînek/ Dîtin, raman 4-Di elfabeya Kurdî de xwendina tîpekê 4-Êş, derd/ Bi hin zimanên Ewropî 'na' 5-Ekonomîst 6-Jîr/ Bê dê û bav 7-Navê darekê 8-Xwarîna me ya bingehîn/ Hêt/ Sembola Amerîkîyûmê 9-Ard, arvan/ Peyva nêr a



'kê' 10-Serokê êl û eşîrê 11-Di dîrokê de yek ji hikûmariyeye îslamî 12-Xanesaz, arkîtet

BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Faîk Bûlût/ Ka 2-Efser/ Adenî 3-Rîkn/ Lt/ Kûvî 4-Mr/ İsa/ Ey/ İn 5-Aştîxwaz 6-Naştin 7-Dager/ Şe 8-İnad 9-Roro/ Axa 10-Lîsan

Serejêr: 1-Femandar 2-Afir/ AA/ Ol 3-İsk/ Aşgêrî 4-Kenîşte/ Os 5-Br/ Stîrî 6-Lain/ Nan 7-Lat/ Şax 8-Ûd/ Ewledar 9-Tekya 10-Nû 11-Kivî 12-Atîna

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tirkîyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopîyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Kadırga Liman cad. No.92
Eminönü 34490 İstanbul Tel: 518 25 28

Fax: 518 85 54

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Em bi hev re hîn bibin

EM ÇI NE? WÊNEYÊN ME XÊZ BIKE


Ez di erdê de hêşîn dibim. Serê min di axê de diçe xwarê. Qûna min li jor e. Ez zirav û dirêj im. Rengê min sor e. Di min de vîtamîn jî heye. Ez hêşînahiyekek im.

Ez bi daran ve hêşîn dibim. Ez girover im. Di hundirê min de, dendik jî hene. Vîtamîna C'yê jî di nava min de heye. Lîmon, mandalîn û klementîn jî birayên min in.

Ez wek tovekî biçûk têm çandin. Piştî çend rojan, ez zû hêşîn dibim. Ez bi leman ve hêşîn dibim. Ez dikarim gelek mezin bibim. Qalikê min kesk e. Hundirê min sor e. Di hundirê min de, dendik jî hene. Dema em baş negihîjin, ji me re dibêjin kal an jî kalik.

BIHEJMÊRE Û BOYAX BIKE

4	Kesk
5	Qehweyî
6	Zer
7	Sor



HEVOKAN TEVÎ NAVÊN WÊNEYAN LI CIHÊN VALA BINIVÎSE

Ez dixwazimek av vexwim.



Em du dikirin.



Ewyekî nû dikirin.



Te cotekên nû kirîn.



Ev e.



.....yê te mezin e.



.....a we şaş diçe.



.....a te pirr qalind e.



Min sê dîtin.




Ev pirr biçûk e.




Dilo,ê te ne mezin e.



Ez kedî me
yan jî kûvî me?
Navê min binivîse!



BIHIZIRE Û BIBÎNE!



Di wêneya hêla rastê de pênc kêmasî hene.
Tu dikarî wan bibînî!

Evîna Laleşê û hesreta Çiyayê Şengalê


Mazhar Günbat

Kurdên êzîdî ku îro zehfên wan ji warê bav û kalê xwe dîr ketine tevî vê yekê, herdem bi çardestan bi dîne xwe yê pîroz ve girêdayî mane û hesreta vegera ber bi Çiyayê Şengalê û Lalêş ve hê jî bi xurtî di dilê wan de heye.

Îro hê jî li ser rûyê dinyayê pîr gel hene ku, ji ber bîr û bawerî, ji ber raman û daxwazên xwe yê neteweyî û mirovî tîr perçiqandin û eşandin. Lê ku di nav wan gelan de muqeyesek bê kirin û li ser zilma herî dijwar lêkolînek bê kirin, xuyaye ya li ser Kurdên êzîdî wê rêza yekemîn bigire. Ji ber ku, ew hem Kurd in, hem jî êzîdî. Ew hem ji aliyê neteweyên serdest, hem jî ji aliyê hemneteweyîyên xwe yê misilman ve zilmê dibînin. Ev zilma ku hê jî li gelek deveran didome, ji destpêka pêldana misilmaniyê ve xwe nişan daye û di demajoya hezar salên dawî de, bi taybetî jî bi avabûna dewleta Osmanî û vir ve ta berî çend salan, her çûye gurr bûye. Zilma ku herî zehf li zora Kurdên êzîdî diçe, ya ku bi destê Kurdan, Kurdên misilman, li wan tê kirin e. Gelek êzîdîyên ku me bi wan re li ser rewşa wan xeber da, gazînen xwe wiha tînin zimên: "Zilma dijmin, zilma neteweyên serdest ên dagirker zêde li zora me naçe her çendî dijwar be jî. Helbet em serî li ber tu zilmê natewînin. Lê, zilma dagirkeran dikare were îfade û şrove kirin. Em zanin ku ew dijmin in, nijadperest û dîktator in. Bes zilma ku birayên me yê Kurd ên misilman li me dikirin, em pîr diêşandin. Ew birayên me ne, lê bi cavê dijmin li me dinêrtin, ji ber ku bi listikên dijmin dihatin xapandin. Helbet, ev zilm îro pîr kêr bûye. Bes zehf caran ji ber wê zilmê hema nemaye ku me dêv ji Kurdîtiya xwe bemedaye."

TEWRA MISILMANAN

Gelo, çima Kurdên misilman bi wî awayî li hember êzîdîyan hereket kirine, zilm li wan kirine, bi dijmin re bûne yek, êzîdî ji ber dîne wan biçûk ditine û kenê xwe bi wan kirine. Bi rastî, heta berî neh deh salan li başûrê Kurdistanê mirov bi cavê xwe dikaribû ev neheqîya ku misilmanan li êzîdîyan dikir, bidîta. Gelek misilmanên nezan û muhefezekar dema êzîdî diditîn, an jî dema êzîdî di ber wan re derbas dibûn, bi mebesta biçûkkirin û hêskirinana wan, bi dengê bilind digotin. "Nalet li Seytên" Hinekan jî digot ku bêhna genî ji êzîdîyan tê. Heta, ketibû devê zarokên biçûk wan jî digot: "Êzîdî ne, cilsipî ne



Xidir Pîr Silêman

cehnemî ne û hwd."

Rast e êzîdî cilsipî ne bi pirranî. Lê ew bi xwe xwe wiha tarîf dikin: "Êzîdî ne, cilsipî ne, cinetî ne." Li dijî gotinên misilmanan, carina ew jî hêrs dibin û dibêjin: "Misilman û man û man" an jî carina bi henekî dibêjin: "Ev misilman pîr ecêb in, îşê wan tune diçin serê... xwe dibirrin."

Ev gotinên hîciv her çiqas bi henekî hatine gotin, dîsa jî helwest û tewrên wan ên li hember hev îfade dikin.

Helbet li gelek welatan ji bo ku gel bibin nêyarên hev, serdest û dagirkeran dîn û mezheb bi kar anîne. Naveroka dînan hatine xerakirin, taybetiyên dîni yê baş dane jibîrkirin û li gor berjewendiyên xwe, yê xerab wek tovên neyartiyê xistine nav dîni û bikar anîne.

NAVGÎNA KEDXWARIYÊ

Dema em li dîroka Kurdan dinêrin, em dibînin ku dîne Kurdan yê herî kevin Zerdestî ye. Piştî Muhamed, Emeviyan misilmaniyê bi darê zorê bi Kurdan dane qebûl kirin û yê misilmaniyê qebûl nekirine an hatine qetilkirin, nefîkirin an jî hatine perçiqandin. Helbet bi vê jê nemane, Kurdên ku bûne misilman li dijî yê êzîdî û yê dîni bi kar anîne, ew bi hev dane kuştin. Bi pêşketina tevgera rizgariya neteweyî û şiyarbûna civakî her çiqas vêga, çî yê misilman, çî yê êzîdî û xiristîyan êdî gelê Kurd zû bi zû naye xapandin jî, di dîrokê de ji ber nezaniyê vê meselê serê gel pîr êşandîye û bi pirranî jî li êzîdîyan neheqiyên pîr mezin hatine kirin.

Ji xeynî Emeviyan, di dema Împaratoriya Osmanîyan de jî, gelek padişahên Osmanî bi vê metoda bikaranîna dîni, bi sedsalan bi destê Kurdên misilman gelek Kurdên ji dînen dîni, dane kuştin û nefîkirin. Bi vî şêklî herdem Kurd xapandine û di bin himaya xwe de razandine, şêlandine û perîşan hiştine.

Ev jî bûye egerek ji yê herî girîng û bitesîr ên bindestmayîna gelê Kurd.

Em dîsa werin ser êzîdîyan.

Bingeha dîne êzîdî diçe digihîje dîne Zerdestî. Zerdestî, ji dîne herî kevin e Kurdan e. Di nav Kurdên misilmanbûyî de hê jî mirov rastî gelek taybetiyên dîne Zerdestî tê. Mesela, agir tîştêkî pîroz e di dîne Zerdestî de îro jî di civaka Kurdên misilman de agir navgîneke serfîrazîyê ye û rengê sor e ku ji agir tê, li cem hemû Kurdan wek rengê pîroz û neteweyî tê qebûl kirin.

Her çendî Kurdên êzîdî û misilman bi du dînen cuda ji hev qetiyane jî, zehfên nîrx û kevneşopên wan yek in û awayê jiyana wan jî hev zêde ne cihêreng e.

Ji ber listikên dagirkeran Kurdên êzîdî, ji mecbûrî car caran xwe ji misilmanan dîr girtine û bi serê xwe jîyan e; lê tu caran taybetiyên xwe yê neteweyî, hest û hesreta xwe ya ji bo Kurdistanê serbixwe wînda nekirine.

Li aliyê dîni, tevî hemû xweparastîne, xwe veneqetandinê jî neteweya Kurd, vê pest û zilma ku di pêvajoya dîrokê de li ser êzîdîyan hatiye pêkanîn, hin taybetiyên negatîf jî derxistine holê di civaka Kurdên êzîdî de. Mesela, ji ber ku êzîdî bi pêvajoyên dirêj ji civakên misilman dîr ketine û bi taybetiyên dîni ve zêde hatine girêdan, hin terîqetên an jî tebeqeyên dîni di nav wan de dirûv dane. Ev tebeqeyên ku êzîdî wek terîqet bi nav dikin, di rastiya xwe de bûne wek çînen civakî. Mesela, di nav êzîdîyan de çar, hinek jî dibêjin sê çînen civakî afirîne. Û ev çînen civakî ku mîrên êzîdîyan wan wek terîqetên dîni bi nav dike, bi taybetiyên pîr cihêreng jî

hev vediqetin. Di hemû tekiliyên êzîdîyan de taybetiyên wan terîqetan xwe didin xuyakirin. Yek ji yê dîni nikare bizewice, her yek ji wan xwedî rist û wezîfeyên cuda ne û hwd.

Li gor Xidir Pîr Silêman ku Serokê Nivîskarên Kurd ên Dihokê ye, di nav Kurdên êzîdî de sê mewqî hene: Şêx, pîr û mirîd. Pîr Silêman van mertebeyan ne wek terîqet, lê wek çînen civakî dinirxîne. Li ser tîkiliyên êzîdî û misilmanan jî dîtinên xwe wiha tîne ziman: "Têkilî û hevbendiyên êzîdî û misilmanan, berê pîr ne baş bûn, çûnkî misilmanan, nexasîme Kurdên misilman dixwestin Kurdên êzîdî bi kotekî û zorê bikin misilman. Lê niha nava me û misilmanên Kurd, nexasîme yê şoreşger û rewşenbîr baştir e ji berê."

LALEŞ Î ÇIYAYÊ ŞENGALÊ

Pîr Xidir Silêman ku heta vêga sê pirtûk û gelek nivîsên wî hatine çapkirin û weşandin, bi pîrs-girêkên civaka Kurd, bi taybetî jî bi yê Kurdên êzîdî re pîr eleqedar e, ji bo çareserkirina van pîrs-girêkan serê xwe pîr diêşîne û bêrawestî dixebite. Pîr Xidir, pîrozî û girîngiya Laleşê jî bo êzîdîyan wiha vedigot: "Geliyê Laleş, geliyê pîr rind û ciwan e, bi dar û ber û av e. Geliyê pîroz e li cem Kurdên êzîdî. Nişan, mezar û meqamên tev xas û babçakên êzîdîyan lê hene. Laleş heca êzîdîyan e, Kaniya Spî muhrawan e. (di nav geliyê Laleşê de Kaniya Spî di nav şikeftê de ye. Ji ava Kaniya Spî re dibêjin 'ava zemzemê' û wek aveke pîroz

tê qebûl kirin.) Ev geliyê ku bi 90 km. dikeve joriya Mûsil ji Dihokê bi erebeyê di saetekê de mirov dikare xwe bigihîjîne. Li ser Laleşê gelek serpêhatiyên dîrokî hene, ev serpêhatî bi çend gotinan nikarin bîr ziman, pirtûk bi wan tîje dibin.

Bi kurtî, di dîrokê de ji Zerdestî bigrin ta Hezretê Mesîh, Laleş bûye perestgeha gelek bîr û baweriyên pîroz.

Dema ku filetî li Kurdistanê peyda bû, fileyan Laleşê jî êzîdîyan standin û heta çerxa(sedsala) pêncan piştî zayîne di destê wan de ma. Di dema Şêx Hadî de careke dîni Laleşê kete destê êzîdîyan. Çend caran jî Kurdên misilman êrîş kirine ser Laleş. Carek du car jî Laleşê kete bin himaya Osmanî û Îraniyan. Dawî li sala 1908'an Laleşê dîsa gihîşte me û hê jî di destê me de ye.

Ji bo Çiyayê Şengalê jî dikarin bi kurtî vê bibêjin: Çiyayê Şengalê jî bo êzîdîyan kela berxwedan û xoragîrê ye. Her dema ku êzîdî tengav bûne û babelotên mezin hatina serê wan ji bo xweparastîne, qesta Çiyayê Şengalê kirine."

TÊKILIYA JIN Î MÊRAN

Li gor nivîskar Pîr Xidir, tîkiliyên jin û mêran, li nav êzîdîyan pîr nûjen û xwezahî ne. Van tîkiliyan bi kurtî wiha tîne ziman: "Di nav êzîdîyan de tîkiliyên jin û mêr, xort û keçan tîştêkî asahî ye. Bi hev re diçine şol û kar, şahî û dîlanan bi hev re dikin. Li cejn, tewaf, xoşî û seyranan jî tim bi hev re ne."

Wê bidome



Laleş û êzîdî bi hev re bûne wek goşt û hesî. Kurdên êzîdî jiyaneke bê Laleş nafîkirin, Meke jî bo misilmanan çî be, Laleş jî ew e ji bo êzîdîyan.

welat

- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnişan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.